

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

# bîrnebûn

hejmar 61 | 2015



Ew ê her di bîra gelê kurd û bi  
taybetî jî kurdên Anatoliyayê de bijîn!..



Bîlal Ercan, 1962 - 17.12.2014



Aliyê bombe baranê, ji arşîva taybet a ajansa Reuters

Erol Can (Serhildan Demhat) 1986 - 2014



*Murat Bozlak, 1952 - 4ê çile 2015*



*Ali Çetinkaya, 1955-2015*

*Em ji malbat, heval, dostên wan û gelê kurd re  
sebir û sersaxîyê dixwazin!*

*Redeksîyona Bîrnebûnê*



# bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 3 nummer per år.

Çar mehan carekê derdikeve.

**Utges av Apec Förlag AB**

hejmar 61 | 2015

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi

**Edîtor:** Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

## **Koma hevkarên vê hejmarê**

Ayten Akgeyik, Ali Çiftçi, Dr. Mikailî, İhsan Türkmen,  
Xizan Şilan, Mûlla Evîndar, Muzaffer Özgür, Nuh Ateş,  
Seyfi Doğan, Kemal Demirsoy, Mem Xelîkan û Yusuf Polat

## **Adress**

Navnîşana li Swêdê

Box: 8121, SE 163 08,

Spånga/Sverige

## **E-post**

info@apectryck.se

## **Internet:**

www.birnebun.eu

## **Têkili/İlişki**

Danimarka: İrfan Baysal, 0045-27 11 58 83

## **Belavkirin / Dağıtım**

Ewropa:

Muzaffer Özgür

Bîrnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln / Almanyay

Tfîn: 0049-172 298 24 51

Türkiye

İstanbul

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı:

Europa: 5 Euro

Türkiye: 5 TL

## **Abone**

Swêd: 400 SEK • Almanyay 40 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

İsveç hesap numarası: (Bîrnebûn) bankgîro: 402-2224


Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İsveç dışındaki aboneler için

APEC, "Bîrnebûn" Bankgîro—Stockholm/Sweden

**BIC/SWIFT: DABASESX**

**IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874**

Çap / Baskı: Apec—Tryck AB



**Fata Mestî Nazê** ji gundê Xelika Jor

Wêneyê berg: **Fata Hecî Hemê**, ji gundê Xelika Jor

Çavkaniyay wêneyên Fatê Hecî Hemê û Fatê Mestî Nazê Mustafa Ateş e

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tîn,  
serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan  
nayên vegeandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û

Komela Ziman li Almanyayê piştgîrên kovarê ne.

## Naverok

- |                                                                            |                                                                            |
|----------------------------------------------------------------------------|----------------------------------------------------------------------------|
| Ji bîrnebûnê 6<br><b>Alî Çiftçî</b>                                        | 32 Hevpeyvînek bi Ayten Akgeyikê re<br><b>Îhsan Türkmen</b>                |
| Erol Can (Serhildan Demhat) 7<br><b>Muzaffer Özgür</b>                     | 35 Fanosa dilê reben<br><b>Xizan Şîlan</b>                                 |
| Kampanya înzayê ji bo Încowê 8<br><b>Muzaffer Özgür</b>                    | 37 Helbest<br><b>Seyfî Doğan</b>                                           |
| Hevalê hêja, dozgerê kurdan, Murat Bozrak 9<br><b>Mem Xelîkan</b>          | 38 Newalê Zîlan<br><b>Seyfî Doğan</b>                                      |
| Bilê Gulê (Bilal Ercan) 11<br><b>Yusuf Polat</b>                           | 40 Gulnarînê<br><b>Xizan Şîlan</b>                                         |
| Sterkeka din rijîya, li pey parêzer Ali Çetinkaya 16<br><b>Yusuf Polat</b> | 42 Sohbetek bi Miçê Bêkir va<br><b>Nuh Ateş</b>                            |
| Em kî ne? 19<br><b>Mem Xelîkan</b>                                         | 47 Bibin yek<br><b>Kemal Demirsoy</b>                                      |
| Pêkenok 26<br><b>Mulla Evîndar</b>                                         | 48 Veguherîn - Franz Kafka<br>Werger: <b>Nuh Ateş</b>                      |
| Kilamek 27<br><b>Mulla Evîndar</b>                                         | 63 Sîyarê Têrika—4<br><b>Dr. Mikailî</b>                                   |
| Dîlanek ji Anatoliya Navîn 28<br><b>Ayten Akgeyik</b>                      | 69 Helbestên Tomas Tranströmer bala herkesî dikişînin<br><b>Alî Çiftçî</b> |

# Ji bîrnebûnê

Ziman û nasname ji bo têgîhiştin û nasandina însanan du faktorên herî girîng in. Ji bo ku meriv kesayetîyeka însanekî têbigihê û wî/wê nasbike divê meriv derûdora ku ev însan jê tê, baş bizanibe ka di kîjan civatê û kulturê de mezin bûye. Lê kesayetîya însanan ji ber bûyerên cûda û tercubeyên jîyanê ve jî tesîr werdigrên. Di civatekê de tesîra herî pir û girîng ziman e. Bê ziman di civateka teybetî de meriv zû bi zû nikare cih bigrê û danûstendinên civakî peyda bike dema tu zimanê wê civatê baş nizanibî.

Bi rêya ziman meriv dikare sîgnalên danûstendinê, nasandina kesayetî û kodên civatê yên nehatine nivîsandin bi riheî fêrbibe.

Ziman di eynê wextê de dikare sîno- ra dayne ka kîjan danûstendin û kesayetî bi îmkân an bê îmkân in, bi dest bixe.

Dema ez behsa gotina ziman dikim nekû ez ferqa navbeyna du zimanan, wekî kurdî û tirkî dikim. Bo min, zimanê min yê dayîkê yanê zimanê min ê pêşîyê (kurdî) û zimanê min yê duduyan (tirkî/swêdî/îngîlîzî/almanî u.h.d.) heye.

Lê wexta ez behsa nasnama xwe dikim, yanê ez kî me, kesayetî? Nasnameya min çi ye?

Ev pirsana ji bo her civatekê û her mîletî stûnên pir girîng in. Wek di gotinên pêşîyan de jî gotine; însanekî bê ziman wek merivê lal e! Merivê lal dema di civatekê de kesek bi zimanê îşareta fêhmneke, ew dê xwe li derweyî civatê

bibîne! Pirê caran ev kesên nivzimanî û bê ziman agresîv dibin.

Ji bo her însanekî zimanê rast zimanê wî/wê yê dayîkê ye. Ev zimanê ku pê derûdora xwe nas kirîye û dikare hîsên xwe û danasîna bûyeran rasterast li gor xwe, bi xwe bawer bêje! Zimanên din bo wî/wê maneyên navendî yên rast nadin.

Ji ber vê ye ku a niha di nav civata me ya kurdan de, di gelek aliyên civatê de em rastî seqetîyan tên. Gelek malbat, nas û dostên hev, merivên hev, pismam, dotmam, pisxaltî, qîzxaltîyên hev, ji ber nezanîna zimanê dayîkê yê hevpar ji hev dûr dikevîne.

Êdî wiha bûye ku kurdên bajarî, kurdên derveyî welêt û kurdên li gundaya mayîn, ji derveyî nakokîyên sosiyal, nakokîyên nasnamê û zimanî destpêkirine. Ev ji bo kurdên me yên bakûrê welêt, çi li nav Anatoliya Navîn be û çi jî li bajarên Kurdistanê be, her wek hev in.

Îro, ziman û nasname ji bo me, pîrsgirêka herî girîng e û divê her kurdek; çi sîyasatmedar, ronakbîr, nivîskar, rojnemevan û xebatkerê civakî û çandî be, dîvê ji bo perwerdeya bi zimanê dê, seferber bibin û bi hewldanên cûrbicûr fêrî kurdî bibin. Ji bîrnekin ku fêrbûna zimanê dê pêwîstîyeke ji bo gihêştin û xurtbûna nasnameya netewî û şexsî ye. Ev ji bo kurdan hîn zêde derbas dibe. Ji vê ye ku gotina, "*hêvîsîna makziman xwenasîn e*" di cih da ye. Fêrbûna kurdî di bin şerd û mercên îro da ne zeh-

met e. Bi sedan, hezaran nimûneyên kurdên ku bi kar û xebata xwe ya şexsî fêrî kurdî bûne hene. Yek ji wan **Ayten Akgeyik** e ya ku bi nivîseke xwe bûye hevkarê vê hejmarê. Bi xwandina nivîsa wê û hevpeyvîna bi wê ra hun

ê pê bihesin, ka ew çima û çawa fêrî kurdî bûye. Em Aytenê pîroz dîkin û dibêin, tu bi xêr û li ser seran hatî nav koma hevkarên Bîrnebûnê.

Alî Çiftçî

## Erol Can (Serhildan Demhat)

1986 – 2014



*Aliye bombe baranê, ji arsiva taybet a ajansa Reuters*

Erol Can; kurdêkî ji Anatoliya Navîn ji Konya–Sarayönü gundê Kadioğluyê ye. Ew ji wek gelek Kurdên Anatoliya Navîn bi malbata xwe re li derwayî welat; li welatê Norwêçê cîh û ar digire û dijî.

Dema DAÎŞê erîşî Kurdistanê Rojava dike, biryara xwe dide û beşdarî refên PYDê dibe.

Erol Can, di şerê Kobanê de di êrîşa daiş a xwînxwar, di bombebaranekê de şehîd dibe.

Haval û malbata wî, şehîd Serhildan Demhat ji Rihayê hil-digirin û tinîn Konyayê. Bi beşdarîya gelek heval, hogir, dost û malbatê, şehîd di roja 19.11.2014an li goristana Musalla ya li merkeza Konyayê de defin dîkin.

Erol Can jî wek şehîdên Kurdistanê bîrnabe û di nav tevgera Kurd û Kurdistanî de dê herdem bijî!..


## KAMPANYA ÎMZAYÊ JI BO ÎNCOWÊ

Muzaffer Özgür

Gelek salan kurdên  
încowê li ber xwe  
dan ku qeza  
încowê bibe  
bajarok, lê tê zanîn  
ku bi ser neketin.  
Dema çend sal  
berê devleta Tirk  
qanûna meheli ya  
şarederiya mezin  
nû kir, xeyal û  
daxwazên kurdên  
încowê û yên  
gundên dor aliye  
wir tune bûn. Li  
dawiyê incow bû  
mehela Cihanbeyli  
ye.

Li gor agahdarî û îstatîstîkên  
încowê; Încow gelek pêşketiye.  
Ji aliye aboriya xwe, şaredarî, jiyan,  
nifus, erdnîgarî û perwerdebûnê ew  
te îspat kirin. Qada incowê ji 15  
qezeyên giredayî bajarê Konyayê  
ya mezintirî ye.)

Încow zûva ye qezabûn heq kiriye.  
Lê dewleta tirk naxwaze li navçeyên  
Tirkîyê kurd bi serê xwe bibin xûdan



cîh û war. Gelek caran siyasetmeda-  
ran soz dayîne lê dema çûyîne An-  
kara ew gotinên xwe jibîrkirine. Ca-  
rek din ji li paş xwe mêze nekirine.  
Niha çend kesan însiyatîfek avakiri-  
ne û ji bo avakirina qeza incowê bi  
erêkirina qaymakamê Cihanbeyliyê  
kampanyaya înzaya destpêkirine.

Ev kampanya bi form nivîsine û  
li ser malpera Facbookê berdewam-  
dike.



# HEVALÊ HÊJA DOZGERÊ KURDAN MURAT BOZLAK


*Mem Xelîkan*

Mala felekê bişevite, ya ku dagirkeran nikarî bike wê kir. Hevalê hêja, welat-perwer, demoqrat, hevalê şoreşger û jêhatî, dozgerê Kurdistan, vekilê HDP î Adanê, parêzer **Murat Bozlak** bi nexwaşîyeke bê çare, xopana şêrpençeyê ji nav me girt û bir. Lê ji dilê me, esle...

Parêzer Murat Bozlak, jîyanhevalê Seycanê, bavê Rûken, Remezan û Berk, kalê Lavîn, Murat û Aryayê wû. Roja 4ê çileyê 2015an, ji nav me barkir û çû ser diloanîya xwe. Murat Bozlak, sala 1952ya li gundê Aktaşê yê girêdayîye bajeroka Şereflî Koçhîsarê (Ankara) hate dinê.

Dibistana seratî pola 1-2ya, ji bo ku dibistan li gundê

wana tune wû, li gundê Damlacikê, pola 3-5an li gundê xwe xilas kir. Dibistana navîn li Kuluyê, lise li Ankarayê xwand. Dibistana bilind, li zanîngaha „Ankara Hukuk



Fakültesi“yê xwand. Dûva, li Kuluyê bi cih bû û dest bi parêzerîyê kir.

Di SODEPê de dest bi karê sîyasî kir. Wê rojê şûva, tu caran ji fikir û ramanên xwe tawiz (pêvaberdan) nedan. Li pirsgrêka Kurdan xwedî derket, ji bo mafê gelê xwe yê netewî –demokratîk xebat kir. Xebatkarê mafên mirovan yê demokratîk û kesetî wû. Li hember zilm û zorê, zordestîyê tu caran paşda gav neavit. Ji bo wê jî, bû kelemê çavên dijminan. Roja ku xwînxwaran parêzer Faik Candan qetl kirin, ji min re got «Tu li ferqê yî dagirker bi qetlkirina Faik peyamekê didine me, didine Kurdên Anatoliya Navîn. Dibêjin ku “hûn di cihê xwe de rûneniştin, we deng biderxist, encama wê jî vava ye. Emê we jî mîna Faik tune bikin”. Lê ew hewêsa yê dilê wanan de bimê..... »

Parêzer Murat Bozlak, di nav siyaseta Kurdan de li Ankarayê bûyî wû berdevkê Kurdên Anatoliya Navîn. Ji bo siyaseta Kurdan, windayîyekî mezin e. Jîyan û xebata wî, di siyaseta Kurdan de cihekî girîng digire. Di SODEP, SHP, HEP û HADEPê de endamê banî wû. Neyar ji xebat û berxwedana wî ditirsîn. Pîrr caran ew binçav kirin, heps kirin. Newû, qûrşîn kirin, bîrindar kirin. Lê negihêştin ber tu

mirada, bi wî hevalê delal, jîr û jêhatî yê ku tu gav paşda neavitin.

Xortê Anatoliya Navîn î şervan, di rojên bi ba û bahoz de serokê HADEPê yî giştî wû. 3 salên seroktîyê di hepsê de derbas kirin. Dûve, sîyaset ji vî re qedexa kirin. Vê demê, di nav DTP ê de cih girt û xebat kir. Li hîlbijartina 2011an ya giştî, ji vekîlên serbixwe yê ku bi piştgirîya BDP hatin hîlbijartin, ji Adana re bû vekîl û kete Meclîsê (TBMM.)

Hevalê hêja Murat di nexwaşîya xwe de jî qet rûnenişt. Li hîlbijartina 2014an ya heremî, ji cem toxtora bîderdiket xwe diavite qada digihêste mitîngan. Digot: « Li Kurdistanê ji bo me Amed çî ye, li Anatoliya navîn jî, Kulu-Cihanbeyli ew in. Em li van herdu bajarokan şaredarîyan qezenc bikin, mîna ku em zikê neyaran kêr bikin. » Çikas rast gotiwû. Lê...

Erê hevalo, hê pîrr rojên te bidîtan hebûn. Malşevitîya felekê tu bi fizikî ji me veqetandî. Tu di dilê hemû kurdan de dijî, tê bijî....

Serê kurdan sax be, serê malbata te sax be, serê heval û hevrêyên te sax be...

Ji te re oxir be...

Em te ji bîrnakin.....

# BİLÊ GULÊ (Bîlal Ercan)

Yusuf Polat



Bilê Gulê, 1978

Kalikê Bilê, Mamê Hamolê ji Xelikan (xelikên jêr) dîsa li ser rê ye. Bi xwe bazîrgan e, li hemû gundên derdora harêma Înevî, Kulek, Bala, Heymana, Polatli, Koçhîsar, Yûnak, Kadinhanê digere heta Şam û Halebê dihere. Li

wir ji dewecîyên xwe re hêştiran distîne. Çima ku mutahîdê Xanê (Tuzla) ye, divîya ku „xwê“ li pir derên welatê Osmanîyan were belavkirin. Kurdoxlû, bi navê din Sefikan, ji Xanê ne pir dûr e, zozanake wan bi navê Şukur heye. Çend kerîyen Mamê li wir in, bona wê ji tim û tim diçû Kurdoxlûyê. Li Sefikan duh mal, qebîleyên mezin hene. Torinan û Pişleman. Wiha tên naskirin. Min wiha ji devê pîrika xwe bihîstibû. Mamê Hamolê dostanîya **dostanîya** malbata „Torinan“ dike. Li vê navbarê jina xwe di canî de rehmetî bûye, keçikek jê maye. Mam êdî bêkar e. Li sala 1910 an bi Nûra Hecxelîl ji malbata Torînan re dizewice.

Bi wê zewacê malên Mamê Hamolê êdî zêde dibin. Bilê Qaraj-

Mamê Hamolê û Husê malê  
Ûsiv, ku mêrê xunga xwe ye, û  
duh hevalên wan li  
Istanbul–Kadiköy, sal 1918)



daxê (Xelikên jor), gundê Bulduk û Kadinxanê Kordoxlû jî lê zêde dibe, çûyîn–hatin pir dibe. Şeş kur û keçê xwe dibin. Ya herî biçûk Gul e.



Gula Mamê, 2005

Pîrika me (ya min û Bilê Gulê) keçika xwe ya biçûk dide lawikê birayê xwe Miçê. Ne bi dilê wê bû ku ji gundê xwe bi dûr keve, here gundê Sefkan. Bi qedera xwe razi dibe, bi lawê xalikê xwe, Miçe Mihemed re dizewice. Lawê wan î yekem Memik e (Mehmet Ercan). Yê duyem jî Bil e, Bilal Ercan. Tê bîra min. Xaltîya min sûva hatibû, li mala me bû. Mala me ji ber pîrr sedeman jê re „bavan“ bûn, çima ku bavê min jî pismamê xwe bû. Xaltîya min bi duh hala bû, lê wê nedizani ku kîngê zarokê we wê were dinyayê. Xaltîya min za, lawikek xwe anî dinyayê. Ew

roja tê bîra min. dayîka min bi lez û bez xeber ji lawê xalê xwe, mêre xaltîya min re şand, ku lawîkek wî din jî bûye. Ma **hay jê** hebe. **Er ê**, Bil devdeve bihar an jî peyîza 1962 yan li mala me, ku xanîyên kalikê me, Mamê Hamolê ne, tê dinyayê. Ew xanîyên ku di sala 1900 da çê bûyîn hîn sekinî ne.

Bil derdora 10 salî ye. Xaltîya min bona ku zarokan bi xwendin bide, bar kire Konyayê. Duh salan li Konyayê man. Hîngê xuya dibe, ku meyla Bilê stranan heye. Xalê me, Hesên pandomîmek dîyarî wî dike. Ew roj va roj, yanê heya roja ku Bilê delal ji dinya ya me here mala xwe ya ebedî, 17.12.2014, bi sitranan re mûjil dibû. Di bêşa xwe de serkeftî bû jîr û jêhatîbû. Wek xaltîya min ji dost û heval û merlixiyê hezdkir.

Gula Mamê ne her dayîkek bû, ne wek her jinek bû: ew jinek vêrik bû, yêke welatparaz û welathez bû. Ji mêj da ji Kurdistan re wekhevî dixwast. Berî sîh salî doza Kurdistan kire ya xwe, bi giregirên Kurdistan va danûstandin çêdike, Leyla Zana, Morat Bozlak û hîn pir kesên din tîna mala wê, lawê xwe Memik (Mehmet Ercan) di sala 1989 an da ji HADEPê dibe namzetê perlemana Tirkîyê, û li herêma Konyayê hîngê 39.000 deng werdigre. Ger li wî welatî

bend(baraj) nebûya, Memik diket  
perlemanê. Li ser vê yekê Dewleta  
Tirkîye heyfa xwe ji wî digire, wî  
tevî M. Bozlak 28 Mehan davêje  
girtîgehê.

Lê belê Bil jî nasekine, hûnera  
xwe her diçe bi pêş dixe, kilam li  
ser kilaman çêdike, awazên xwe  
wek yên Kurd Remzî digehejin  
herêma me û Ewrûpa, bernemeyan  
di televîzyonan de çêdike. Mîrov  
dikara bibêje; Piştî Kurd Remzî  
Bîlal kesê duyemîn bû di herema  
me de bi nav û dengê xwe. Me go  
çî ? Bilo di hunera xwe de serkeftî  
bû. Belê wî heya 200 kilam û awaz  
çêkirin, bixwe çêdikir, bixwe digot,  
pir hunermandan jî kilamên Bilê di  
radio û televîzyonan de distiran.

### **Kal im**

Bêkes im, birindar im  
Ez mam wek agirî  
Bi vî barî ez narim  
Agirê ku xwîn digirî  
Bar, barekî giran e  
Zulm û şer neterkî  
Bê hal im, neçar im  
Wek barane dibarî

Kal im, kal im, kal im  
Kal im, kal im, kal im

Jo bi te ez bê hal im  
Jo bi te ez bê hal im  
Birina min bê derman e  
Birina min bê derman e  
Hezar sal in dinalim  
Hezar sal in dinalim

Gelê min gelek baş e  
De bira bes e, rabe  
Hezar sale nixaş e  
Welatê me xirab e  
Nizanim dujmin kî ye  
Her dem bûn dîlşikeştî  
Him li pêş, him li paş e  
Te nexwast, kes nade

Kal im, kal im, kal im  
Kal im, kal im, kal im

Ji bo te ez bê hal im  
Ji bo te ez bê hal im  
Birina min bê derman e  
Birina min bê derman e  
Hezar sal in, dinal im  
Hezar sal in, dinal im

Piştî kilam û stran, Bilo bû  
awazekar, bû bestekar û şirovedar.  
Kilamên wek Berdel, ku peyvek has  
bi Kurdî ye, di her zimanekî dinyayê  
de tune, li Tirkîyê hema–hema ji  
alîye her hunermendekî va hat û tê  
stirandin.



## Berdel

Oy Berdelim Berdelim  
Aşiret koymaz gelim  
Gelinsin yad ellere  
Lal olsun ağzım dilim  
Gurbet eli dolandım  
Seni alırım sandım  
Dediler gelin oldu  
Yandım ateşe yandım  
Töre töre töre mi  
Kimler sara yaramı  
Yari Berdel ettiler  
Tükettiler çaremi  
Zalim töre bat töre  
Yandım göz göre göre  
Yari Berdel olanın  
Çaresini kim vere

## Ay Delal

Delal, tu canê min î  
Xewn û xeyala min î  
Belê çavê min kor e lê, lê  
Ronîya çavên minê  
Êşqa te ji min giran lê  
Mala min bû ya wêran  
Carek bersîv bide  
Can û dilê min qurban  
Agir bi dilê min ket lê lê  
Kes nizane halê min  
Delalê, tu eşqa min î lê lê  
Mala min bûye wêran  
Ey delalê, ey delal  
Tu wekî avekî zela  
Bi eşqa te dinal im  
Bêmecal im, bê hal im

Di zaningeha Hacettepe ya li Anqerê de dibe rêberê musîkî û folklorî, ders dide, li wir û li navçêya Çankaya kom û komikan daifrîne, bi komikên reqsan va li hemû dinyayê digere, teve festivalan dibe, xelatan digire. 200 berhemên xwe di ME-SAM (Dezgeha Parastina Xwedîyên Berheman) tomarkirî (qeydkirî) ne. Însan dikare bibêje, Bilo di qada çêkirin û afirandina awaz û berhemdayîne de gelek serkeftî bû, yek ji wan kesên sereke bû, ku piranî kilamên xwe bixwe çêdikin û distirên. Bilî wê, ji pirr kes û dezgehan re ji şewirmendî kir.

Mirin li pêş herkesî ye. Ango dawî û paşîya herkesî rehmêtî ye. Ya giran, mirina bê wext e. Bilê li Anqerê Studyoke xwe çêdike, heval û dost ji wê sûd (feyda) digirin, bixwe jî berhemên nû dide. Naxwaşîya xwe qet neda ber çavên xwe, bo herkesî, her kurdekî, her karekî amade û fedekar bû, ne tirsonek û bizdonek bû. Di navenda Tirkîyê de, ango di dilê Tirkîyê de, di qada kurdî da gavek bi paş de neavêt. Ji alîya tirkîyan va dihat hezkirin. Di şeva “Bîranîn û Piştgirî” yê de, li 22.01.2015an bilî kurdan duh hezar jî tirk hebûn. Va jî nîşan dide ku, kê doz û daxwaza xwe

ya rewa, bi aşî, hevaltî û dostî hewar kir, ew î serdikevê, nayê ji bîrkirin.

Pir rûken û henekdar bû, li civîn û cemat, di bernameyên xwe de henekî û yarênîyên xwe kêr nedibûn, însên kêf dida, ji kenan dîteqîya geh li vê hêlê, geh li wê hêlê xar dibûn, ku însan bi xwe bi xwe digot, “xwezkê, ew ji mala me be”. Erê, Bilalê delal, pixaltîye min î jîr û jêhatî, zîrek û serkeftî ne tenê ji mala me, mala

“Mamê Hamolê” bû, ew ji mala hemû kurdan bû, dilê wî ji hemu kurdan re diavît, lê li dawîya her dawî bi “Kobanê” va ket, sekînî; mêratê dil carek din ji xewa kûr ranebû. Kobanê wêran bû, bes azad bû, lê pixaltî yê min ? Bilê Gulê Mamê wê herdem di dilê me de be. Binêrin ka însanê dilxweş û zimanxweş, rûken û rûnêrm di helbestek, kilamek xwe yî din de çi gotîye:

## Delal

Gökyüzünün kameri  
Sanki cennet feneri  
Delalımın uğruna  
Neler çektim neleri

Delal Delal Delalım  
Hangi derde yanalım  
Şu üç günlük dünyada  
Gel beraber olalım

Delal'ın bahtı kara  
Yüreği göz göz yara  
Delalımdan ayrılmam  
Çekseler beni dara

Delal gönlüm dilberi  
Başım gözüm üstünde  
Gözleri güler ama  
Kan ağlıyor yüreği

## Anayurdum (Adıyaman)

Dağlarında kar boranı  
Yiğit dolu herbir yanı  
Gözleri yaşlı anamı  
Dağlar köyümü özledim

Anayurdum babayurdum  
Bin kere rüyamda gördüm  
Uğruna canımı verdim  
Dağlar köyümü özledim

Dağlar ovalar yaylalar  
Sılda sevdiğim ağlar  
Eller al o kara bağlar  
Dağlar köyümü özledim

Anayurdum babayurdum  
Bin kere rüyamda gördüm  
Uğruna canımı verdim  
Dağlar köyümü özledim

# STERKEKE DÎN JÎ RÎJÎYA !

Li pêy Parezer Ali Çetinkaya

Yusuf Polat

Împeratorîya Osmanîyan dema xwe tijî kir, dawîya xwe hat; serbajar Stanbul hate dagirkirin, Sultanê osmanîyan welatê xwe gora peymanê Sewr radestî dagirkarên Engilîstanê û yê din dike; bes li Anatolîyê serxwebûn û berxwedan hîn nese kinî ye. Li ser vê, rêberên Engilîstan êrkan didin Mistefa Kemal, daku here li Anatolîyê wê berxwedanê bişikene. Di vir da du tişt pîrr girîng bûn.

1) Kazim Karabekir û Fevzî Çakmak

2) Hêza Kurdan.

Ger Karabekir û Çakmak bi Mistefa Kemalê Selanîkî, ku kes kalik û kalikê



Kongre ya Sêvasê 1919

kalikî wî bile nasnake, rê nedabûna wî, dawîya wî dihat, tiştê nedikir. Lê belê wan her duyan piştawazîya Mistefa Kemal kirin. Li Erzûrum, Erzîncan û Sêvasê komcivînan çêdike, kurdan li xwe dide hev, sozan dide kurdan ku ew tevhev şerê ejnebîyan bikin, dewleta kurdan û tirkên ava bikin. Rêberên kurd qanî dibin, alîkarî dikin. Li Antep, Maraş, Urfayê gelê kurd bi serê xwe bê alîkarîya dewleta Osmanî û hêzên Kazim Karabekir şerê dagirkaran dike, piştra bona vê lehengîyê navên wek „serketî, leheng, bi navûdeng“ li wan dikirin. Gelê Egê wek bajarên Aydın, Îzmîr, Manîsa, Muğla, Denizli, hwd. kesekî xwe diparêze nîne, Yewnan heya Sakarya digrên.

Piştî rizgarkirina welat Mistefa Kemal di sala 1924'an de zago-





# 49'lar davası

Ön sıra:Yavuz Çamlıbel,M.Ali Dinler,Şehabettin Septioğlu, Sait Elçi,Sait Kırmızıtoprak,Ziya Şerefhanoglu  
2.sıra: Necati Siyahkan,Örfi Akkoyunlu,Selim Kılıçoğlu, Canip Yıldırım,Halil Demirel,M.Nuri Direkçigil  
3.sıra:A.Efem Dolak,Musa Anter, Ferit Bilen  
4.sıra:Şerafettin Elçi, Feyzullah Demirtaş,Mustafa Ramanlı,Sait Bingöl,yaşı en sağda Emin Kotan  
en arkada gözlüklü Mehmet Özer

nek datîne, ku tê da carê sifteh navê „Netewa Tirk“ xuya dibe. Li Lozan gotin, „erê navê dewleta me Komara Tirkîyê ye, lê ew komar ji du netewan pêkte; kurd û tirk.“ Bes kurd di nazarî û amelî (teorî û pratikê) de tiştek bo welat û gelê xwe nabînin, serhildidin. Mixabin berxwedan û serhildana kurdan hat şikandin.

Herçiqas ku bi deh salan bêhesîyek wek `sukuneta goristanan li civaka kurd` mexmûr ji kiribin vîna gelê kurd neşikeşt. Ro-

nakbir û xwendewanên kurd roj bi roj xurt dibin, radibin ser çokan, li welat û nemaza li Stanbol û Anqerê deng didin. Ew dengên biçûk bile, sazûmana dewleta kemalîst û kujer vedincikîne, ditirsîne. 49 ronakbîr û xwendewanên Kurd 20 salan piştî komkujîya Dersîmê tên girtin.

Dirok û serpihatîya her yek ji wan LEHENGÊN kurd bo hemû kurdan êrkek netewî ye. Bêzanîn, ew kî ne, kî bûn, çi kirin, çi nekirin. Li ser vê kevneşopîyê, li ser rê û rêçana



Ali Çetinkaya, yê navbaerê tavî duh hevalên xwe

49yîyan xwendewan û ronekbîrên kurd her terin xurt dibin, roj bi roj bi quwet dibin, doza gel û welatê xwe dikin, dibin têkoşerên azadiya welêt. Bê tirs û xof dibin rêberê gelê xwe. Yek ji wan rêberê jîr û jêhatî û wêrek birêz kek Ali Çetînkaya bû.

Ne qewlê herkesî bû ku li wê demê wek 49yîyên nemir destê xwe têke bin kevr, bo welat û gelê xwe, dahatin û azadiya xwe têke xetarê. Ew na karê her camêrî, her şêrî bû. Ew karê şepalekî wek Ali Çetînkaya bû; li Anqerê xwendivan e; li zanîngeha wir bêşa hiqûq dixwîne. Wek pir kesan xwe nade hêleke, nareve, êrka mîrovatî, kurdîyatî û welatparezî dide ser milê xwe, dikeve nav tevgera Kurdistan ya hîngê heyî, DHKD. Bi havalê xwe va milê xwe didin milê hev, her xeterîya ji alîya dewleta hov û nijadperest û kujer va dide ber çavên xwe, tekoşîna gelê xwe dike. Kek Alî tê girtin û darizîndin: Dadgeh bona tevlêbûna tevgera Riya Azadî-TKSP çar sal ceza dide wî. Ew jî para xwe ji zor û zexmet û îşkenceyên li girtigeha Amêd digrê.

Ji hepsê derket bi şûnda wek parazer li bajarê Konya kar dikir. Dema li Tûrkîyê kurdan partiyên legal avakirin, di nav karûbarê legal de cîh girt. Bû serokê rexistina HEP ya bajarê Konya ye.

Di nav partiyên wek DEP, DDP û HAK-PARê de bi çalakî cih girt, her dem destê xwe kire bin kevir; hevalî, dostanî û fedakarîya welat û gelê xwe kir. Em wek heval û hogirên Bîrnebûn kar û bar û vîna kekê Ali ji bîr nakin; Ali ji gundê Xirabê/Beyliova-Cihanbeyliyê bû. Bi malbat di nav tevgera azadiyê de cîh girtibû.

Bi xebera reş me, wek kovara Bîrnebûnê, dostekî xwe yî hêja û jêhatî, zana û qedirbilind wenda kir. Kek Ali ji destpêka derxistina kovarê de tekilî bi me re çêkir û bû aboneyê me. Bi ditîn û ramanên xwe bi me re bû. Me dostekî xwe yî hêja û qedirbilind wenda kir, sterkeke me yî din jî rijî; em xemgîn in.

Ma serê malbata wî, heval û hogirên wî sax be, mekanê wî bi bihûşt be.

### GIRÎNGÎYEK:

**Numra kontoya me hatiye guhartin! A nû ev a li jêr e:**

**BIC/SWIFT: DABASESX**

**IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874**



# EM KÎ NE ?

## Mem Xelîkan

Ser sokanê rûniştîwû. Serê wê navbera destan de, kûr û kûr difikirî. Tîna germê rojê sibê, dida enîya Edûlê. Gundê wana, di navberê du neqewa de û bi du taxa wû. Her taxekê pišta xwe dayîbû neqewekê. Navbera wan de aveke şên û zelal diherikî. Li her du alîyên çem, darên bî rêz dibûn. Her biharekê der dorên gund, bi gul û kulîlkan dixemilî.

Dema ku xasîya Edûlê, bi dengêkî tijî gir û bar; Edûl, ji xew rabê. Karên malê li benda te ne. Te hîng fêhm nekiryê! Ez Hemo yê xwe yî delal bi te nadim xwarin! Şûnê kû kûr û kûr difikirî, mîna bûkên xelkê, dergûşekê bide hemêza xwe, got. Edûl hate xwe û çû hundir.

Edûl, bûka du salan bû. Mêrê wê Hemo, li bajêr kar dikir. Ji du-sê mehan carekê dihate gund ziyareta wê. Ji bo ku Edûl bê zarok wû, tim di devê gundîyan de wû. Diçû dawetekê, diçû şînekê ji ber pirsên « Hê tiştî te tune? » bêzar dibû. Ji bo wê jî nedixwast ji mal derkeve. Xasî û xezûran jî, bê zarok bûyîn li her rabûn û rûniştinê dikirin serhevda serê wê. Ji bo ku yên wê, ji Hemoyê xwe yî ku ew pirr jê hezdike, bidin

berdan tim ditirsî. Wê fikirê jî, dinê li serê wê teng, jîyan bê tehm kiriwû.

Rojekê; – Ez, ji wendakirina te pirr ditirsime. Çi bikim? Xwedê nekire nesîb. Were, tu carek din bizewice. Ez bê te nabim. Ez a derdê hewîyê bikişînim, got, ji Hemo re.

Bi wê gotinê Hemo, pirr qarî û xulî bû. Bi dilê xwe zewicî wû. Ji Edûlê pirr hezdikir.

– Ez î sibê vegerime bajêr. Carek din bifikire. Çend caran min ji te re got, dixwazî em ji wan devan xilasbibinî tu jî were em herin bajêr. Li wir em ê bi serê xwe, di mala xwe de hê rehet bikin.

– Em ê çîng herin bajêr! Debara xwe çîng bikin? Him li bajêr, Xwedê zarokan bide me?

– Ez î kar dikime. Qezenca min, besa me ye. Jîyan bê zarok jî dibe. Em ê di mala xwe de bêdeng, bê eş, ji zar û zimanên vanan xelas bibin.

Bê zarok bûyîn, ji Edûlê re bûyîbû zilm û zehmet. Ji ber ku ji hevalan wê “hê tiştî te tune?” nebihîze, dernedikete nav gund. Du rojan xasîyê, mînak ku wê bênamûsî kiribe, gotibû; Te serê me jî, yê dê û bavên xwe jî berjêr kir! Carek din,

neçû bavanên xwe jî. Hemo deng dikir wê tu bersîv nedida.

– Edûl, tu zêde serê xwe diêşînî. Em hê civan in. Bi xêr be, çand salan şûva be. Xwedê yî mezin e.

– Erê, tu xweş dibêjî. Lê, ez ê nawêrime bi dergûşeke cîran û hevalan şa bibim. Çend rojan berê, bi Berfîna Eşê şa dibûm, hat ji dest min girt bir. Tu were ji min bipirse, dina min xelîya. Mîna ku ez ê dênezêrk bim, çavên min ê pêvadin, ji vê tirsîya be.

– Wana çi fikirên te ne? wana kê kirin serî te?

Hemo; tu nizanî, gotinek mezina heye. Zarok; kurik pêşeroja meriya ne. So, em kal û pîr bûn, kî yê li me mêzeke? Kî yê bi ser me de were? Kî yê deriyê me jihevke?

– Dev ji van fikirana berde û guh bide ser min. Vê carê ez vegeyîyam, tu amade bî. Ez çûm ne çûm, ez ê li xanîyêkî bigerim. Ez ê werim, te bigrim, em ê herin bajêr. Carek din jî, venagerim van deran.

– Kêmayîya min heye. Ez nabime dayîk. Lê, sûcê te çi ye? Yekî rahîştî destê zarokê xwe digêrîne dibînim, dilê min bi te dişewite. Ez ne ku nexwazîyê dikime. Bi feleka xwe qehr dikime

– Tu zanî!! bi van gotinan min jî qehr dikî!. Carek din dibêim; dev

ji van fikiran berde! Xwe ji çûyîna bajêr re amade bike. Got, Hemo.

Hemo vegeyîya bajêr. Wî her roj ji kar bi derdiket bi şûnda, taxeke bajêr ya te, va ya min li malekê digêrî. Dûva, bi alîkarîya hevalê xwe Hecî, nêzikî mala wî xanîyêk girt. Hecî û xanima wî Xan, mamoste wûn. Hembajarîyên wî wûn. Gundên wanan, cîran wûn. Nasên wanan hevpar hebûn.

Hemo û Edûlê, ne bi dilê dê û bavên wana be jî, barkirin hatin bajêr bi cî û war bûn. Xanima Hecî, Xan, cîvan be jî, mamosteke zana, hiş li serî, jineke dîti û derbas-kiri bû. Ji Edûlê re bû rêhaval. Destê xwe bi ser re digirt, û alîkarîya wê dikir. Bi kêmasî be jî hayjê mesala Edûlê û Hemo hebû. Rojên ku ne diçû kar, bi destê Edûlê re digirt li bajêr digêrand. Diçûn perqa. Diçûn sînemayê. Ji xwarin û vexwarinê de bigire, hetanî rabûn û rûniştinê, kinc lixwekirinê wê dixwest Edûl, wek jinek bajarî bibe. Edûl di hundirê şeş mehan de hatibû guherînê. Edûl, ne jineke ji jîyana weng dûr wû. Lîse hetanî pola dudiyan xwandî wû. Dane mêr şûva, xwandina wê di nîvi de mayibû. Hemo bi wê rewza Edûlê kêfxwaş dibû. Hezkirina wî, her diçû zêde dibû. Bajar li wanan hatibû.

Xan: – Edûl, zanî hûn ji gund

hatin şûva, rewza we bi min hê baş tê. Psikolojîya Hemo û te hê baş e. Lê, dizanim serê te ne rehet e. Bê zarok bûyîn, ji serê te nayê derê.

– Xwuşka Xan, ez rinda gund wûm. Delala dayîka xwe wûm. Min pirr dixwast bixwînîm. Mamosteyên min, ji min zêde hezdikirin. Digotin “tu keçeke çê û jîr î. Tu ya bibî jineke mezin.” Lê; çi bikim ew jî bi nîvi ma. Pirr xortan ez xwestim. Lê; eşqa min û Hemo, wek ya Mem û Zînê wû. Xwedê, dawîya eşqa me şukir wek a wan ezîzan nekir. Em gihandin ber miradê me. Lê; bi nîvi ma. Ez, nekirim dayîk. Hemo, bê zarok e.

– Çima? huro çi bûye? hûn hê cîvan in, bi xêr be, ew jî ya bibe.

– Gotinên min li gund bîhistî, ji serê min nayên derê. Xasîya min, ez wek bênamûs hesibandim. Got; te serê bavê xwe berjêr kir. Li her dol û dawetekê hevalên min, wek ji min re rindiyekê dikirin, digotin “Wê, hê tu dergûşên te tunen”. Ez aciz dikirim. Mîna ku ez ê bi destê xwe me, mîna ku ez naxwezime ku dergûşekê bidim hemêza xwe. Ez naxwazime ku Hemo, destê dergûşa me bigire bigerîne. Lê; çi bikim! difikirime, dibe ku ez nifirî me! Hena jî, “Wê, Hemo hê nezewicî ye? So, hûn kal pîr bûn, kî li we meskê? Nabê ez te berdim” kevir bi min ve didan.

– Çima nifirî yî ? Çima weng difikirî ? Ew fikirên te şaşitî ne. Xelk dibê çî, here bê. Her tişt ne bidestê meriya ne. Nexwaşxane hene, bijêjk (Toxtor) hene.

– Ka bijêjk jî, fêda xwe nebû.

– Em hetanî huro çûne cem bijêjkeki tenê. Wî got; “tişteki xwe tune. Ji bo ku Edûl bibe dayîk tu kêmayî tunen.” Tu jî sebir bike.

– Lê; kanî?

– Min navê bijêjkekî din, ji hevalan girt. Yekî baş e. Dixwaze Hemo jî, bi me re were. Dibe ku, zarok ji wî nabine.

–Wê, tobe, ez tişteki weng ji Hemo naxwezim.

– Na, na tu mereq neke. Ez dê ji Hemo re bêjim. Hemo meriyekî hiş li serî ye. Min şaş fehm nake. Roj derbas dibûn. Edûl, ji aliyekî de bi hatina xwe ya bajêr xenê wû. Ji devê xasîyê, ji devê gundîyan xelas bûyîwû. Lê; ji bo ku nebû xwedî zarok tim xemgîn wû. Xanê, rojekê ew bire sazîya parastina zarokan. Di ser sedî re, zarokên bê dê û bav li wir dijîyan

Xanê: Aha, wana giştik zarokên me ne. Zarokên dê û bavên wanan, nikarin wana bi xwedî bikin û mezin bikin. Dewlet li wana xwedî derdikeve û wana li sazîyên veng mezin dike Malbatên bê zarok, car caran yên bi

zarok jî, tèn ji vira zarokan digirin dibin. Ji wanan re, dibin dê û bav. Wek zarokên xwe, wana mezin dikan.

Edûlê, tu bersîv nedane wê. Bê deng ma.

– Min, bi şaşitî fehm neke. Em ê, hê ji te re li bijêjk û dermanan bigerin. Lê, nebû, tu nikarî ji wanan yekî re bibî dayîk? Aha, va xortî hana Sertac, ez pirr ji hezdikim xortekî delal e. Destê xwe rakir, Sertac hele were vira, got.

Sertac meşîya hat û xwe awite hemiza Xanê. Xanê jî, ew ramûsand, wî jî destê Xanê maç kir. Xanê, ji Sertac re, Edûl nîşan da û waya xaltîya Edûl e, got. Edûlê ew maç kir. Xanê ji çentê xwe pê nûs û lînûsek û gorek derxist da wî. Sertac, jê re spasî kir. Dû re xatire xwe xwastin û veqetîyan.

Ji wê rojê şûva, çend caran Xan û Edûl, çûn hatin sazîya zarok parastinê. Pêlîstok dikirîn, dibirin ji zarokan re. Bi wan zarokan re dilîstin, sohbet dikirin û wext xwaş derbas dikirin. Êdî Edûl, li wextên xwe yê betal, bi tenê jî diçû û dihat cem wan zarokan. Çend caran jî, bi Hemo ve tev çûn hatin. Xan bi vî halî Edûlê kêfxwaş dibû. Dema ku qala Sertac dikir, Xan hê xenê dibû.

Xan: – Edûl, ez mês dikime tu ji Sertac pirr hez dikî.

– Erê. Xwîna min dikele ser wî.

Zarokekî pirr xweşik e. Ez diherim cem vî her tiştêkî ji bîr dikime. Mês dikime ew jî, her dawîya hefte çav li rêya min e.

Ber êvarê bû. Ewrên reş dagirti bûn ser bajêr. Bajar, di nav mij û dûman de wû. Edûl û Xan, diçûn civîneke jinan. Di civînê de, jinek li ser mafên jinan diaxîftî. Axaftina wê, gotinên wê pirr çûn xoşa Edûlê. Çikas rast dibêjê, got ji Xanê re. Li derketinê got;

– Xwûşka Xan, jikî ku min dest bi kar kiriye wir de, dina min hate guherînê. Mala te ava be. Li dûkana dûrinê, him qezenc dikime, him jî pirsgirêkên xwe ji bîr dikime. Hevalên nas dikim, zêde bûn. Pirr û hendik, ji bo debara malê jî baş bû. Wexta xwe jî, hê baş derbas dikime. Carcaran piştî kar re bi hevalan ve digertime. Diherinî sendîqayê jî. Civînên li wir, min kêfxwaş dikine. Kovarên didin me, bi şev li mal bi Hemo ve tev dixwînin, Hemo jî bi wê kêfxwaş dibe.

– Zanim, tu ji bo aboriyê alîkarîya Hemo dikî. Yek jî, ji bo tu li mal bi tenê nemêyî, wexta xwe baş derbas dikî jî, Hemo xenê ye.

– Min dixwest, huro herim Sertac ziyaret bikim, lê; wext derbas bû.

– Na na, tu nema, xwedîyên malên me jî, ji kar werin. Em ê rojek

din tev da herin. Min jî zûva ye ku Sertac nedît. Min jî bîra wî kir. Di vê navberê de hate bîra min, Xwedê kê em kêngê diherin cem bijêjk?

– Sibê ne du sibê?

Bijêjk, Edûl, Hemo û Xan dayîbûn hember xwe. Ji wana re got; min muayene analiz û testên we xilas kirin. Min ji muayene û testan ew biderxist ku, Hemo û Edûlê tu kêmayîyên wan tunen. Hûn jî dikanin wek her kesekî bibin dê û bav. Ez î jî Edûlê re çend dermanan binîvisime. Dixweze tu, dev ji wanan bernedî, zeman gerege. Şeş meh-salekê dixwaze dermanan vexwî û ji mehekê carekê werî ba min.

Bi gotina bijêjk, her sê jî xenê bûn. Xatir xwestin û veqetîyan.

Bi rê de Xanê; Hemo, va çi civake? Me, jinan wek ne tu tiştî dibînin. Kanî, jin mal wûn! bermalî wûn! kewanî wûn!. Bê zarok bûyîn, sûcê jina ye? Hewîyê bîne ser. Lawik nebûn, hewîyê hûne ser. Namûs jin in. Navbera du malbata de şer çêbibe keça xwe bide xortekî malbata din, ji bo ku şer daweste. Deyndarî, keça panzde salî bide kalekî, tu ji deyn xelas bibî. Nizanim! Em kî ne, Em çi ne?.

Hê şor devê Xanê de bû, Edûlê «em, mîh nî» got, an: – Erê, erê em mîh nî, bi çavên wanan.

Edûl: –Hê îda berê, em çûne gund. Xasîya min, hê negotibû bi xêr

hatî, ji min re got; Mîna mîh ya sewr, terî terîyê li xwe mezin dikî, mîna bûkên xelkê, dergûşekê bide hemêza xwe!

Xan: –Mîh, ne weng e? Bûyî dayîk, mîh ya bi berx, nebûyî mîh ya sewr. Çi ferq dike?

Hemo: –Erê, erê min jî, Edûlê jî, ji dest dayîka min pirr kişand.

–Ne dayîka te tenê, zilm û zora civakê li ser me jinan heye, got, Xanê.

Jiyana Hemo û Edûlê, li bajêr her diçû xweşik dibû. Ew ji jîyana xwe memnûn wûn. Her du yan jî, karê xwe berdevam dikirin. Edûl, wek erkekê (Wezîfe) her mehekê diçû bijêjk, bi Xanê ve diçû civînen demoqratik. Sertac ji bîr nedikir, her ku betal dibû, diçû ziyareta wî. Ne dizanî, wext çing derbas dibû. Ji jîyana xwe, memnûn wû. Jîyan jî, ji wanan re her diçû xweşik dibû. Nêzî mala Hecî û Xanê, maleke xwe ya biçûk ji standiwûn. Di wê malê de, hê rehet kirin. Bi mala xwe xenê wûn. Jîyan ji bo wanan, her diçû bi rindî dihat-te guherînê. Piştî çend mehan, sibekê Edûl, ji xev rabû, hişê wê diçûn. Hemo, çûyîwû kar. Hundirê wê lihev-diket. Çû ber laweboyê, verişîya. Bi lez kincên xwe li xwe kirin, meşî çû mala Xanê. Hal hekata xwe ji wê re got.

Xan; –Waya mizgîna xêrê ye. De zûke, em herin cem bijêjk.



Bijêjk; dû çend test û analîzan ve, çavên we ronî, Edûl bi du cana ye. Herdu jî, bi wê mizgînê difiryan. Bêjêjk, ji bo ku ew dergûşa xwe biparêze, çend şîret lêkirin û ew bi rê kirin. Bi dest re, mizgîn dane Hemo û Hecî. Bi şev, li mal di navbera xwe de şênayîyek biçûk çekirin. Edûl;— Ez ji we re tiştêkî bêjim. Ez huro him xenê me, him xemgîn im.

Xan: —Ew, ji bo çi ye?

— Min omdîya xwe birîwû. Ji bo, ez êdi nabim dayîk. Min, xwe ji Sertac re dayîk, Sertac jî lawikê me ye, xwe amade kiriwû.

— Erê, niha çi bûye?

— Min dixwest, em Sertac ji xwe re bikin ewled. Ez jî Hemo jî, ji wê re me xwe amade kiriwû. Em ê wî ji sazîya zarokan bigirin bînin mal û mezin bikin.

— Hûn dixwazine, dîsa dikarin wê bikin. Xeraw e ! hûn ê bibin dê û bavên du zarokan, got Xanê.

Hecî: — Mîna berê, herin ziyaretê Sertac werin. Qasî ez dizanim, ew lawika jî we wek malbata xwe dibîne. Jîyan bi wê xwaş e. Bi destê wanan girtin, alîkarîya meriva kirin, meriva di jîyanê girê dide.

Hemo: —Ew jî, ya bibe. Çima nabe. Xwîna min jî dikele ser Sertac, ez wî wek lawikê me hezdikim, got. Edûl bi wan gotinan fireh dibû.

Ducanîya Edûlê, jîyan her diçû xwaş kiriwû. Rewza wanan, hê baş wû. Mîna berê, herduyan jî karê xwe berdevam dikirin. Edûlê, her ku wexte xwe dibû Sertac ziyaretê dikir. Bê qusûr diçû, rendewûyên bijêjk. Her tiştêk di rê de wû. Edûl jî, Hemo jî bûyîbûn endamên sazîyên karkeran. Her yek li beşa sazîya karê xwe tev li çalekîyan dibûn. Edûl a berê ya gundî çûyîbû, Edûleke din; zana, ji bo mafên karkeran, mafên mirovan, jinan, mafên kesetî, azadî û demokratîk xebatê dikir hatibû dinê. Hemo jî, wek wê di sazîya karkeran ku beşa karê wî girêdayî de berxwe dida. Têkilîya xwe û gund bîriwûn. Di mala xwe ya biçûk û şêrîn de, jîyan didomandin.

Sertac dawîya heftan di hate mala wan. Edûlê, serî û kincên vî dişuştin, ûtî dikirin. Carcaran ew dibir li nav bajêr digeland. Dibir perq û sîneman. Her diçû Sertac dibû xortekî çeleng. Edûl û Xanê, li mala Xanê sohbetê dikirin.

Xanê; Edûl gotina te ya "em mîh ne!" çikas rast e. Civak jinan wengê dizane. Mêrekî xanima xwe rehmê bû, dora dine royê, yê jê re, li jînekê bigerin. Lê; ji bo jinan wengê? Na. Salên xwe çend dibin bila bibin, yê bibêjin; kurikên xwe hê biçûk in, dixweze li ser wanan rûne û wanan mezin bike.

Edûl: – Erê, tu nizanî! Mêr û jinek veqetîyan, jin hatin berdan, ji mêr re zewac heq e. Lê; jinên berdayî dizewicin, hinek mêr, vê ji xwe re bênamûsî dizanin. Jina hatiye berdayî, hê wek namûsa xwe dizanin. Kêr dikin, qurşîn dikin û dikan. Çi ye? Namûs e!

Xan: – Kêr û qurşîn tenê? Jinên ji bo ku zarokên xwe nabin, tên berdan an jî hewî tene ser. Ji bo ku lawikên xwe tunen hewîyê tînine ser an jî tên berdan, ji bo wê zilm û zora dibînin, di mêjoyên wanan de ne kêr in? Ne qurşînin? Dîsa dipirsim Xwedê kî, jin çî ne? Kî ne?

Edûl – Kêr û qurşînen xasîyê, heval û cîranan li mêjoyê min xistî ez dizanim.

Roj, dû nîvro. Edûl ji kar biderket. Diçû mal. Dergûşa xwe, hêdî hêdî mezin dibû. Sê-çar mehî bûyîbû. Êdî, bi pîhna li zikê wê dixist. Ew lîstika dergûşê, di zikê wê de ew pirr kêfxwaş dikir.

Li ser rêya mal, li navenda bajêr, dît ku; komek karker daxuyanîyekî didine. Polîsan, wek her dem dora wanan hewş kiribûn. Edûl tev li karkeran bû û dest bi guhdariyê kir. Demekê bi şûva polîsan êrişe ser wanan kir. Polîsan karker şeqe bi şeqe kirin. Kî bi dest polîsa diket, bi pîhnan û jopan ew diêngavtin. Polîsekî bi pîhnê li zikê

Edûlê xist. Ew gêrbû û li erdê dirêj bû. Wek aveke germ, xwîn bi ser canê wê de dihat û li bedena wê belav dibû. Çend hevalan, bi lez ew kirin erebekê û gihandine nexweşxanê. Benz lê zer buyîbû. Niv bîrva çûyîwû. Bijêjkê ew mûeyene kirî; “Dergûş miriye”. Dixweze em dergûşê ji ser heyninî. Edûl ne li xwe bû. Dergûşa wê ya ku bi zorê dîtî û wek çavên xwe diparistî wenda kir. Wextê ku Edûl hate xwe, wek dîn bûyîbû. Waya qebûl nedikir. Dina wê carek din, li serê wê reş bû û xelîya.

Piştî Çend rojan şûva, hate mal. Awênîyên Hemo, Hecî, Xanê û Sertac kar nedikirin. Her çiqas Xanê; te dît, tu ya bibî dayîk, bi xêr be carek din be, digot. Wan gotinan fêde nedikir. Digot; salên min derbas dibine. Bawer nakim carek din, bi duçana bibim. Gotinên Sertac wek; kanî, ez lavikê te, tu dayîka min wûyî jî, ew rehet nedikirin. Dina wê xelîya wû.

Çend deman, bijêjk bi bijêjk gerandin. Dîsa, dest bi karê xwe kir lê; roj ji wê re wek berê ne baş wûn. Roj bê moral, xemgîn derbas dibûn. Ji ya berê zêdetir diçû cem Sertac. Sertac jî, xort bûyîwû dest bi zanîngahê kiriwû. Sal hatin û sal çûn, ew bûn kal û pîr. Jîyanê ew zû westandin. Her duyan jî, ji kar dest berdayî, teqewût bûyîwûn. Di mala xwe de,

kal û pîr jîyanek bê hêvî û xemgîn  
didomandin. Nexweş wûn. Hemo  
nexweşê dil, Edûl nexwaşa şekir, bi  
qar, li ser linga wûn.

Sertac, dibistan xilaskirî, zewicî û  
bûyîwû memûr. Dawîya her heftekî,  
bi xanima xwe ve bi ser wanan de  
dihatin. Dermanên wanan dikirin,  
mal paqîş dikirin, ji karên wanan re  
alîkarî dikirin. Wek lavik û bûkekê,  
hetanî bi dest wanan re hatî, tu  
kêmayî nedihiştin.

Ser bajêr de, ewrên reş dagirtiwûn.  
Bayekî sar, merîyan diqefilîne, pelê  
darên payîzê diweşîne, hundirê  
merîyan teng dike, dihat. Di mal  
de; Edûl, Sertac û xanima wî, li dora  
Hemo rûniştine û melle ber balgihê  
wî bi dengêkî zîz, Quran dixwand.

Jîyanek bi dawî dihat. Edûlê,  
Hemoyê xwe yî ku; li ser dinê ji te  
bîtir kesekî min tune digotî, dişande  
ser dilo vanîya wî. Li hundirê malê  
xemgînî û bêçare bûyin rûniştîwû.  
Fêda girî ji tune wû. Lê; ji rûyên  
Edûlê de hêsir bêdeng diherikîn.

Edûl di wê mala biçûk û şêrîn  
de çend mehan bi tenê ma. Digot;  
ez çira mala Hemo venamirînim.  
Derîyê wî nagirim. Xan û Hecî her  
dem li cem wê wûn. Ew bi tenê  
bernedidan. Sertac lingê xwe ji ser  
nedibirî. Çend mehan şûva, ew îqna  
kir. Bire mala xwe. Ji Edûlê re bû la-  
wik, xanima wî jê re bû bûk. Her du-  
yan jî, wek dayîka wana be, ji xizmet  
û hurmeta wê tu qusûr nekirin.



## PÊKENOK

**"Vê germe kî bi Tirkî deng ke!"**

Xalê Qadir ji gundê jiXelika ye, bi tirkî pir nizane.

Havîn e, germ e. Qadir li sîya xêni rûniştiye.

Memûrê nûfûse yê tirk li gund digere. Memûr tê mala Qêdir jî.

Xunga Qêdir dibê: "Qadir were va yî tirk diwê çî?"

Qadir dibê: "Yaw vê germê kî bi tirkî dengke!"

*Berhevkar: Mûlla Evîndar*

# Kilamek

## Bi devoka kurmancîya gundê Xelika

*Berhevkar: Mûlla Evîndar*

"Helkiştîme sirtê qale  
Min dî Elkê li hêla male  
Îşmar daye bi dismale  
Îşmar heyne bi guçike kutane"

Li ba Kurdên Anatolîyê, li gundê Xelika klameke bi nav û deng heye: "Eman Ela". Xwedanê klamê Hemkê Biçûk e. Koma Xelika jî dibê vê klamê. Ew çarîna li jor ti kes nizane. Li gundê Xelika ew çarîna ji aliyê gundîyan va tê zanîn û gotin. Min ew nû berhev kir.

Ya ku li nav gel belav bûyê ew e:

### **Eman Ela**

Eman Ela yaman Ela  
Pore pir li te bûye bela  
Xude dil murade min te bikira  
Mine bikişanda tela bi tela  
  
Cindî cindî Ela cindî  
Av li pore zer cemidî  
Te çî qusûr mane li canke min dî  
Vê ûmdî mam li vî gundî

Here le le here xage  
Orxanê bave ser doşage  
Destî xe di destî min ke  
Qelingî zor e gûca min nage

Hîv helat çîya bilinde  
Şewqa xwe daye bejna rinde  
Wexta ku nebû dil û murade min te  
Ez dînik bûm li vê dine

*(Hemke Biçûk – Gundê Xelika)*

*Çavkanî: Oske Hesên*

# DÎLANEK JÎ ANATOLIYA NAVÎN



*Ayten Akgeyîk*

**E**w cezayê sucekî bû an jî bi xwe sucekî mirovatîyê bû? Dibe ku wîcdan bersiva vê bide. Çi rêwîtiyeke dirêj e sirgûn. Ne, tu dikarî heşên xwe li paş bihêlî, ne jî dikarî bigêhijî welatê xwe yê nû. Mîna ku tu di Erafê de yî. Tu nikarî li welata xwe bimînî û tu carî jî nikarî bibî kesekî ji wira. Tu xerîbê vê axê, vê avê, vê hewayê yî û tû xerîbê sûretê xwe yê ku li neynikê mêze dike yî. Hemû rastî li paş maye. Tiştê ku li wir e tenê bedenê û hêrsa bîrnekirinê ye. Ew e dermana dilên şewîtî. Bîrnekirin û jiyandin!

Çîroka Kurdên Gola Xwê jî, li vir dest pê dike. Ew sîlsîleyeke koçkîrinê ye ku bi sedsalan dewam kiriye. Ji axa xwe, ji welatê xwe, ji zarokatiya xwe hatin sirgûn kirin û deştên Ana-

tolyaya Navîn ji xwe re kirin welat. Komên ku koç kirin, çanda xwe, zimanê xwe û heşên xwe jî, bar kirin û bi xwe re birin. Îxtîmalek mezin bara herî sivik jî ev bû. Lê sirgûn êş bû ji bo mirovatîyê, xatir xwestin bû û valahiyekê mezin bû. Dûrketin bû, pir dûrketin, ber bi jibîrkirinê ve çûyîn, lê jibîrnekirin bû...

Wisa jî bû. Ji axên bi bereket yê Mezopotamyayê veqetiyên û hatin axên Anatoliyaya Navîn ku bi hezaran kilomîtro dûrî welatê wan bû. Ew, Enqere, Konya, Yozgat û Kırşehirê ji xwe re kirin welat. Demek dirêj bi heywandariyê re mijûl bûn û nekarîn li cih û warekî bisekinin û li wir jiyana xwe bidomînin. Ji xwe qet nefikirîn ku li wan deran



bimînin. Loma, heya sedsala 20an nebûn xwedî mal û bar. Xeyala wan a herî mezin ew bû ku wegerin axa bav û kalên xwe...

Çiqas wext derbas dibû didîtin êdî ne mimkûn e ku wegerin welatê xwe. Êdî, bixwestiyan jî nedikaribûn wegerin. Dibe ku êdî naxwazin jî. Ev axa ku qet nefikiriyan li ser bimînin, ji wan re bûbû welat. Ji bo ew kesên ku li ser axa sirgûnê dayik bibûn, axa bav û kalên wan, bi tenê ew çirok bûn ku kal û pîrên wan ji wan re vedigot. Lê ya rast ev bû ku, êdî li wir, yek ji bajarekî li Anatoliyaya Navîn, li gûndekî dijiyan. Ya rast, ji axa welatê xwe dûr bûn, Kurd bûn û dê Kurd bimana. Ev der êdî welatê wan a rastîn bû.

Bav û kalên wan di tûrikên xwe de bi mîrateke gelekî mezin, hatine vî welatê dûr. Mîrateke wisa ye ku bi sedan salan ji neviyên wan re



Gundê Gezeran (Ergin köyü–Bala) ji Ankarayê 63 ji nawenda Balayê jî 13 km dur e. Bi ezlê xwe ji Sîveregê hatine.

dê rêbertiyê bike. Ziman û çanda wan... Ev hebûna wan a herî mezin bû, sedema jiyana wan bû. A rastî, jiyana wan bi xwe bû. Jidayikbûna wan, dîlana wan û şîna wan bû. Ew mîrata herî hêja, dê ji nifşên berê bigîhişt a nifşên nû. Ev mîrat ji bo jidayikbûna wan dê bibûya diayeke Kurdî, di dawetê wan de, wê xwe ji ser agîre sînsingê bavêtana û li ser miriyên xwe dê bilorandana...



Malek ji Gundê Gezeran



Pêşveçûna teknolojiyê, derketina televîzyonê, koçkirina ji gund berve bajêr, perwerdehiya Tirkî, jiyana Tirkî, ev kevneşopî xistine tengiyê. Di vê dema niha ku dinya dibe gundeki mezin de helbet nedihat hêvî kirin ku mîratên deverî wekî xwe bimînin. Lê disa jî, nîşên nû yen ku li hemberî yekrengiyê li ber xwe dide, ji axa bav û kalên xwe dûr, bi bermayiyên vê mîratê dîlanekê li dar dixe.

Em çûn gundekî ku girêdayî navçeya Enqereyê, Balayê. Navê berê yê vî gundî Gezeran e. Lê niha jê re dibejin *Ergîn Köyü*. Ev gund, li Anatoliya navîn di nav çiyayên rût di geliyekî de maye.

Li mala dawatê, mîna berê, berî çend rojên dîlanê telaş û haziriyeke zêde tune. Di dibistana kevn ya ku ji bo dîlanê xizmetê dide de, ji xwe her tişt amade ye. Pir ne, beriya 10–15 salan, bi hefteyan berê kelecaneke mezin diket nava mala dawatê. Mala dawatê berî dîlanê bi hefteyan, mal bi mal digeriya û vexwendinname belav dikir û diyarî dida xizm û nasên xwe yên nêzîk. Dema me bi pîrejinên gund re sohbet dikir, em hînî vê yekê dibin. Berê zarok, di destên xwe de, bi şekiran li deriyê vexwendiyên dixistin û şekir didan wan û ew bangî dawatê dikirin... Lê em niha li ser qerteke ku helbestek hatiye pêvekirin

û xistine hundirê zerfeke bi xeml û xêz ve diçin dawetan.

Dem û cih çiqas biguhere jî, meriv wek berê dimîne. Dema mêvanperweriya ku ji sedan salan hatiye, li vî gûndî hê'j neboriye. Pêşwaziya bi dil û can a ku li me tê kirin, hebûna dostaniyê tîne bîra mirov. Piştî sohbeta dilgerm, em diçin cihê ku xwarin lê tê xwarin. Li yek ji maseyên ku danîne ber hev em xwarina xwe dixwin...

Awazên Kurd ku ji daholê derdikeve, ji derve bangî me dike. Piştî ku me diyariya xwe da xwediyê dawatê, em derdikevin derve. Dahol û zirnevanên ku cil û bergên herêmi li xwe kirine, bi melodiyên nas dilê mêvanan xweş dikin. Demek şûnde orkestra lêdixe. Em yek ji mêvanan bi xaltiya Şerîfe re diaxivin. Xaltiya Şerîfe qala demên berê dike. Demên berê di dawetan de tenê dahol hebûye. Mêvan dilê xwe bi xwe xweş dikirin û bi lîstikên ku bi sedan salan e ji mezinên xwe dîtibûn, dilîstin. Xaltiya Şerîfe paşê qala lîstika sîng sîngê dike. Ji bo sîng sîngê li meydana, agirekî mîna agirê Newrozê tê dadan. Roja dawatê, xwediyên dawatê ji bo ku dara mêşeyê û çirpî bînin, derdiketin çiyê. Dema ku kom ji çiyên dadiketin, jinan kevçî û kuşxaneyên çînko li hev dixistin û ev deng belavî

gund dibû. Mala dawatê bi vî awayî komê peşwazî dikirin. Êvarê bi ev meşe û çirpiyan ve agirekî mezin dadidan. Xortên gund jî li derdora agir govend digirtin û stran digotin. Dema pêtên agirê hinek dadiket, xort diketin dorê û xwe di ser ra diavêtin alî din. Ew şahî heta ber bangê sibehê dewam dikir. Wê demê dawet 3 roj 3 şev dewam dikirin. Lê niha ji ber ku êdî tu kes nikare ewqas li dawetan bimîne, dawet di nav rojekê de xilas dibin. Dem, ji bo me xezîneya herî hêja ye niha.

Orkestra stranekê kurdî lêdixe. Dibe ku ew dewlemendiya herî mezin ya dawatên Kurdên Anatoliya Navin e. Digel faktorên folklorik yê dorhêlê, xwe bîrnekirî ye. Şemmammê, mircan li wan gûndan bûye sirûda dawatan.

Gundiyan ligel wan stranan govendê digirin. Zar û zeç, biçûk û mezin hemû kes ji bo govendên xwe ya ku wê bi sedsalan dewam bike, mil dane hev. Dema ku roj ber bi evarê ve diçe mêvan ji zêde dibin. Govenda ku hêdî hêdî dest pê dike, her ku diçe lêz dibe, tilîlî şevreşa asimanê diqelîşîne. Sohbata me dewam dike. Xaltiya Şerîfe behsa lîstika kamçiyê dike. Ji bo ev lîstika ku bi 2 mirovan tê lîstin, benikî sitûr hewce ye. Heger benikê kalin tune

be, çend heb benikê zirav li hev tên girêdan û bi vî awayî benikê sitûr tê bidestxistin. Paşê lîstikvan bi vî benî didin pey hev û li du hev û li hev dixin. Daholvan jî, ji bo ku vê lîstikê xweştir bikin, dohola xwe lêdixin.

Dema ku Xaltiya Şerîfe qala lîstika kamçiyê dikir, yê li der dor jî starana heneyê dibêjin. Di hundir de amadehiya heneyê xelas bûye, di destê keç û qizan de dibin rêz . Bi çepikên mezin, bûk û zava li ber derî xûya dikin. Orkestra dewam dike:

*Hinê bînin li testê kin*

*Şîr û şerbetê çêkin*

*Kevçî bi kevçî hûn lêkin*

*Bînin li destê zavê kin*

*Bînin li serê bûkê kin...*

Bûk û zava yê ku li ser kursî rûniştine zarokan li dora wan girtine, wek li her derê li vî gûndê Anatoliyayê jî, bûk ji bo ku deste xwe veneke hişk digre. merivên zava jî, zêr dixê kefa destê bûkê, paşê ji deste bûke hene dike. Govendekê mezin ku mîzgîniya xelasbûna dawatê dide tê girtin.

Sibê, bûkê ji mala bavê wê bê derxistin û ew dê bixebitin ku ji nîfşên xwe, kevneşopiyên me yê ku mayî, bikaribin dewam bikin...

# HEVPEYVÎN BÎ AYTEN AKGEYÎKÊ RE

Amadekar: İhsan Türkmen

Ayten Akgeyîk kurdeka Anatoliya Navîn e. Ji Bala (Enqere), ji gundê Gezeran e. Di zaroktiya xwe de malbata wê mala xwe bar dikan, diçin Enqereyê. Li wir zimanê tirkî fêr dibe. Daku li taxa ku ew lê bi cîh in, gelek nijadperestên tirk dijîn, ew naxwaze malbata wê li der bi dengekî bilind kurdî deng bikin. Herwiha malbata wê jî naxwaze tirkîya wê xirab bibe û bi wê ra bi tirkî deng dikan.

Ew li bajarê Îsparta û Enqereyê zanîngehê de beşa radyo-televîzyon û rojnamegeriyê dixwîne. Paşê tere qursa kurdî daku zimanê kurdî bi awayekî akademîk hîn bibe. Niha di TRT Kurdî de montajên bernamêyên Soranî dike. Her wiha ew devokên zazakî û soranî fehm dike û dikare nivîsên kurdî bi tîpên erebî bixwîne.

*Tu dikarî hebkî qala xwe bikî?*

—Ez ji navçeya Enqere, Balayê me. Navê gundê me Ergin Köyü ye. Navê wê bi kurdî Gezeran e. Min di sala 2008 de li Zanîngeha Süleyman Demirelê

beşa Radyo û Televîzyonê qetand. Di heman demê de li wir di rojnameyeke herêmî de jî dixebitîm. Ez paşê hatim Enqereyê û derbasî Zanîngeha Gaziyê bûm û min di sala 2013 de beşa rojnamegeriyê xelas kir. Ji sala 2009an vir de ez di TRT Kurdî de dixebitim.

*Zaroktiya te li ku derbas bû?*

—Zarokatiya min li Enqereyê derbas bû. Ez heta şeş salîya xwe li gund bûm. Paşê ku dema dibistanê hat, wek hemûyan, me ji koçî bajêr kir.

*Gava tu zarok bûyî te bi kurmancî dizanî? Zimanê li gund dihate dengkirin û jê malbatê kîjan bû?*

—Li gundê me, di nav malbata min de her tim kurmancî dihat axaftin. Ji bo wê jî, ji zaroktiya min vir de guhê min her tim li ser bû. Lê rastî, dê û bavê min dema em zarok bûn, bi me re kurmancî nedixavîn. Ji ber ku em li bajêr dijiyan û em diçûn dibistanê, wan nedixwestin tirkîya me xera bibê. Zaroktiya min rastî bûyerên nebaş ên li ser kurdan hat. Li vir, li paytext

Enqereyê rewş aram bû, lê ez paşê hîn bûm ku diya min ditirsiya ku tişteki were serê me. Ji ber van tengasiyan malbata min bi me re kurdî neaxivî.

*Te çima xwest kurdî fêr bibî? Ji bo wê kes bû alîkarê te?*

–Zarokatiya min di taxeke ku niştecihên wê gelek netewperest bûn de, di nav hewalên tirk de derbas bû û ez diçûm dibistanên tirkan. Ew sedem bes in nizanim, lê dema ez biçûk bûm min nedixwest ku malbata min li derve, bi dengekî bilind kurmançî biaxivin. Min difikirî ku ew yek suc e û min difikirî ku ew ne modern e. Niha malbata min henekên xwe bi min dikin, –“Dema tu zarok bûyî te nedixwest em li derve kurmançî biaxivin, niha jî tu kurmançiya me rast dikî!”

Zarok bi hêsanî asîmîle dibin. Sîstem çî dixwaze, wê hîn dike, çî naxwaze wê jî hole radike. Ji bo wê, dema dibistanê pir mûhîm e. Lê dema ku dibistan xelas dibe, meriv bi tena serê xwe dimîne. Ji derva bandorek erênî yan jî neyînî tesîrê li te nake. Dilê te çî dixwaze tu dikarî hîn bibî û tu dixwazî çî bawer bikî tu dikarî bawer bikî. Xwestina min ya derbarê hînbûna kurmançî de jî rastî wana tê. Ez mezin bûm.

Min dibistan xelas kir. Ez di mijara gelek tiştan de hîşyar bûm û min biryar da ku ezê hînî zimanê dayika xwe bibim! Bi rastî min pêşî nedigot “ezê hînî zimanê dayika xwe bibim”. Min digot “ez ê kurmançiya xwe pêş ve bixim”. Wê demê li gor min kurmançiya min baş bû û tenê kemasiya min derbare axaftinê de hebû. Lê dema ku min kovarek stand û rûpelên wê çex kir, min got: “Kurmançiya ku heta niha me deng dikir ne kurmançî bû. Ew tirkmançî bû!” Paşê jî, min dest bi hînbûna kurmançî kir. Niha ez di TRT KURDÎ de dixebitim. Kesên ku li wir dixebitin jî pir caran alîkariya min kirin. Hîn jî gelek rêya min heye.

*Reaksiyoneke çawa ji malbata te hat?*

– Di dema wan de, kurdî zimanekê qedexe bû. Ji bo wan tenê qasetên Şivan Perwer hebûn û tenê bi wan xwe bi zimanê kurdî ve girêdidan. Niha gelek derfet henin. Televîzyonên kurdî, dersên kurdî, qursên zimanan, pirtûk, kovar û hwd. Em di nav wan derfetan de kurdiya xwe pêş ve dixin. Ji bo wê jî malbata min gelek kêfxweş dibe. Carnan qenalên kurdî temaşe dikin û peyvên ku nizanin jî min dipirsin. Ez hîs dikim ku ew gelek şanaz dibin.

*Li Enqerê têkilî di nava yê ku zimanê kurdî hîn dibin de heye?*

– Li Anqereyê komeleya Kursî-Kurd heye. Ew komele ya televîzyonger û sinemagerên kurd e. Li wê derê bi sê zaraveyên kurdî, kurmancî, kirmanckî (zazakî) û soranî qurs tên dayîn. Gelek xwendekarên kurd ku di zaningehên Enqereyê da dixwînin beşdarî wan qursan dibin. Ji xeynî wê Komeleya Demokrasî Çand û Piştewaniya Kurd jî heye ku ev komele jî qursên kurdî dide.

*Tu di TRT Kurdî de dixebitî... Hebkî tu dikarî behsa karê ku tu li wir dikî, bikî?*

– Ez li TRTyê montaja nûçeyan dikim. Piranî li ser zaravaya soranî montaj dikim.

*Çend gotin li ser Bîrnebûnê...*

– Dema ku min biryar da ezê hînî kurdî bibim, min got ez ê pirtûkekê bikirim. Ez çûm ba pirtûkfiroşekî. Bi fi-roşker re me sohbet kir û ew hîn bû ku ez ji Kurdên Anatoliaya Navîn im. Got kovarek derbarê we de heye, tu dixwazî û Bîrnebûn da destê min. Ew tiştekî yekem bû ku kurdî hînî min dikir. Ji ber wê, ji bo min Bîrnebûn gelek mûhim e.

# FANOSA DİLÊ REBEN

Xizan Şîlan

ez ê  
qalikê tirs û endîşeyên dilê xwe  
bişkênim  
li çolistanên gijilî  
xunava lêvên vîzevîza bayê qerisî  
maç bikim  
li tenîştê navnîşaneke windayî  
rûnim  
û bi neynokên giyan  
dîwarê gewhera derûniya xwe  
ava bikim  
tûrikê qencî û rûmetê  
li ser jana piştê xwe  
bigerînim  
bi rîsê helbestên kulek  
di mêjiyên kor de tevna fazîletê  
bihûnim  
di birçî û tîbûna xwe de  
şîrê pêşîra dengvedana şikeftan  
bimijim  
fanosa dilê reben  
li nav gund û bajarên çavbelek  
vêxim  
têlên rêsayî yên mijgirtî ji sînoran  
bişeqînim  
çerxa dek û dolabên çaxa genî  
bi şewata henasa xwe paşpê  
bizivirînim  
qêrîna Şengal û Mexmûrê  
di germa hembêza xwe de



aşt bikim  
 giloka kul û birînên êşan  
 bi awirên raperînê  
 veçîrînim  
 di sebir û xweşbîniya xwe de  
 koletî û bindestiyê  
 ji holê rakim  
 bêhna kulîlkên bihara şad  
 li baxê hezkirinê  
 bireşînim  
 kêfxweşiya demsalên kesk  
 li ser zewiyên welatê şîrîn  
 biharînim  
 ava kewserê  
 di newalên Cudî û Qendîlê re  
 biherikînim  
 kal û pîr û zarokên bêxwedî  
 di qonaxa dilê xwe de  
 bihewînim  
 bedena xwişk û birayên canfedayî  
 bi keskesora rengîn  
 bixemlinim  
 di bin siya dareke stûxwar de  
 bilûra aştî û wekheviyê  
 bilorînim

ala gelên mezlûman  
 li asta çiyayên bilind  
 daçikînim  
 li hespê çeleng sîwar bibim  
 û ber bi hesreta yekîtiyê ve  
 bibeşînim  
 bi tilîlîyan  
 li meydana serhildanê  
 bireqîsim  
 destana egîd û mêrxasan  
 di rûpelên dîrokê de  
 binivîsînim  
 li hember celladên qehpik  
 kirasê serkeftinê  
 li bejna agirê azadiyê  
 bipêçim  
 di berxwedana şerê Kobanê de  
 çirûskên hêviya şervanan  
 bibiriqînim  
 û li ser axa pîroz ya şaristaniyê  
 Kurdistanê serbixwe  
 pêşkeşî Cîhana virek bikim

2014–09–21  
 Stockholm



min jî tevlê bikin  
binivisînin ez jî xemgîn im  
û radigerime  
xewên şevan ê hişyar in  
hawarên zarokan ê ruhî min kotin dikine  
min xwast ku senfonîyêkê ji dengê zarokan ava bikim  
lê notan bara giran nepêjirandin  
xêra xwe  
agiran dewlemend bikin li çîya û banîyan  
ezî dixwazime çavên Zeynokê ku  
tirsa mirinîyê û bêhêvî  
di avên çavên xwe da wenda kirî  
li ber ronahîya agiran bi bengînî  
û  
heyran û heyran temaşe kim  
min jî tevlê hesêp bikin  
mizgînên min ê hene  
tarixê ji me re rupelên newalê zîlanê  
yek bi yek vekirin  
û  
li sîyên zinarên çîyayên bilind zarokên dihilîzîne  
û  
çemên nawalê zîlanê yê hedî û hedî zela diheriqêne

# NEWALÊ ZÎLANÊ

*Seyfi Doğan*

Newalê Zîlanê (Geliyê Zîlan) li qezayê Erdîşê ye. Sal 1930 dem havîn e. Serhildana Agirîyê berdewam dikê. Însanên ku ji ber zilm û zordarî, qirkirin û tehdaya Dewletê Tirkîan direvîn, li newalê Zîlanê kom dibin. Wextê ku Dewleta tirkîan, pêdihêse ku kurd ê li Geliyê zîlanê kom bûna, bi alîkariya ceşşan, erîşe ser koma kurdan dike û 15 hezar însanan qirdike. Bi piranî jin û zarok.

Rojnamê Cumhuriyetê demê serhildane Agirîyê, herdem du pêyvan bi kar tîne. ÎHATA û TENKÎL.

Ew herdu pêyv, polîtîka Dewletê Tirkeyê ye.

**ÎHATA:** KOMKÎRIN (DORALÎGÎRTÎN)

**TENKÎL:** QÎRKÎRÎN

## **Zeyno**

ew  
li newalê di navberê  
du çîyan da heta dûnê  
wê bi hewayê pak  
pişkên xwe bi xwedî kirin  
û ji avên zelal av vexwar  
û jîyana qertalan temaşê kir  
wê  
ew axa pîtoresk  
bi serhildanê xwe xemiland û zindî kir

Rojnama Cumhuriyetê li sala 1930–07–11 weha dinivîsîne;”Îhata harekêti bitti tenkil devam ediyor” (komkîrin, doralîgirtin qediya, qirkirin berdewam dike.)

Not: Sedat Ulugana, bi zehmetekî dûr û dirêj karekî pir bi rûmet li ser hekata Nevalê Zîlanê kirîye. Min jî karê wî feda dît. Mala wî ava be.

Zeyno xanima Reşoyê Silo ye. Herdu jî yê di serhildana Agirîyê da cîh digirin. Herdu jî, bi qehremanîyê û cesaretên xwe navdar in. Eskeran ew xapandin û derdestkîrin. Herduyan jî serjêdîkin û seriye wanan li kolan û kuçên Agirîyê teşhîr dikin.

## **Reşoyê Silo**

piştî xwe da zinarî terî bilind  
xweşikîya deşt û newal temaşê  
û roja teze bi agir pêşwazî kir  
ew li nawala zîlanê hate dûnê  
hostê çîyayê bû  
wî dil û mejoyê xwe  
bi kîn û nefretê nexemiland  
û bi xwedî nekîr  
ew qehremanê cengên  
ji bo azadiya xwe bû

## Komkujiya Helepçê

*Komkujiya Helebçê ya ku 1988an de çêbû û 5 hezar  
kurd hatin kuştin tu car ji bîra kurdan naçe!...*



Foto: Ramazan Öztürk

### 16ê adarê

Dema ku ez ji xewê rabûm  
ku dilê min î zîz e  
û  
ruhê min î teng e  
Min nizanî  
û hişyar nebûm ku  
çî derd e.  
Min bi xwe û xwe got;  
herhal kilamê kurdan ê dîsa bi şîn e.  
Piştra hate bîra min ku  
îro 16 adarê ye!  
Mala minê!..

*Seyfi Doğan*

# GULNARÎNÊ

## Xîzan Şîlan

bêyî te  
li dûrî hesretkêşîya te  
li xerîbistanê  
xweşîkiya rûyê sal û demsalan  
qurmiçîn  
pelên guliyên dara hêviyê  
weşîyan  
baskên çûkê dilê hejar  
şikestin  
rengê çiçekên şadiya rojan  
çilmisîn  
bêrîkirin  
li ber tava rojê  
cemidîn  
ava kaniya jiyanê  
miçiqî  
bêşansiya temen  
bû taca serê min  
li pey gera te  
rêya kelem û striyan  
ket para min  
ji ewrên reş  
xwelî û xubar li ser zeviyên kesk  
barîn

gotinan wateya xwe  
di ferhenga demê de  
winda kirin  
hestên şên û şeng  
di axîna xewên şevistanan de  
qurifîn  
gewriya min  
di keservedana bayê felekê de  
fetisî  
wêneyên albûma bîranînan  
zerikîn  
ez  
di şopa sewdaya te de  
bûm derwêşê çolistanên  
bêveger  
li nav toz û dûmana har  
li tayek porê te ya gulgulî  
digerim  
di nedîtina bedewiya bejna te de  
kal bûm  
di çirûskên awirên te yên melûl de  
heliyam  
di xwendina ayetên sebira xwe de  
gunehkar bûm

di tunebûna te de  
 li tenîştâ balgiya te ya bêhnqurnefilî  
 radimedim  
 payîn bû tîra bêbextiyê  
 û di kezeba min re çû xwarê  
 ez bûm qurbanê ber devê  
 xençereke tûj  
 di tunebûna te de  
 dengê xumxuma şîpa biharên şîn  
 hat birîn  
 stêrkên asîmana sayî li eniya xwe  
 reşgirêdan  
 bilbilê baxê hezkirinê  
 di awaza nalîna berbangê de  
 lal bû  
 di tunebûna te de  
 li meyxaneyan  
 araqâ tenêtiya kambax  
 dinoşim  
 noteyên muzika şahiya dîlanan  
 berbabûn  
 têlên tembûra bêxwedî  
 zeng girtin  
 minafiqan kemîna qehpik  
 li pêşiya arzûyên perîşan danîn

were  
 ken û girînên te ji destê min girtî  
 ji nû ve li min vegerîne  
 kul û birînên xedar  
 bi dermanê lêvên hingivî  
 bipêçe  
 li ser gulgenimên qedera min  
 peşkên barana evîna xwe  
 bibarîne  
 li şeverêşên xewle  
 bibe finda heyveroniya  
 xewnên newêrek  
 giyanê westiyayî  
 li ser doşeka qefesa gewr  
 vehesîne  
 qêrîna dergûşa nava min  
 li ber pêsîrên xwe yên nermik  
 bihewîne  
 û bi henasa xwe ya germik  
 xilmaşîya roniya çavan  
 ji ser min birevîne

2015–01–24

Stockholm



# SOHBETEKE BÎ MIÇÊ BÊKÎR VA LÎ SER CÎNAN

*Nuh Ateş*

Li gorê bawerîyên xurefî û dînî cin hene. Baweriya bi hebûna mehlûqên efsenayî, nerast yê mîna cin, pêrî, dêv û hut ta ji çaxên entîk vir da heye. Di kîtaba mislumana Qoranê da qala cina hatiye kirin û li gorê wê, Xwedê meleka ji ronîyê û cin ji arê vê dû peydakirine. Di kurikî û xortanîya min da yanê pence-şeyst salî di ber vê, li gundê Xelika yê ku ez lê hatime dinyayê û mezin bûme, bi hebûna mehlûqên mîna cin û pêrîyan bawer dikirin. Mezinan hingê teme û şîret li piçûkan dikirin, ew bi cina ditir-sandin û digotin: «Bi şev meherin nav xeraweyan, ser kulingan, ber çem û kanîyan û di kortên kûr û tarî ra derbas mebin, cin ê bi we va din !... » Digotin cin û pêrî dikevîne ton û dirûvê meriv yan heywanan û veng xwe bi merivan dinimînin û dikanin zîyanê jî bidin wan. Meriv ji gotin û çavkanîyên li ser cinan biderdixê ku bi cîsnê xwe cin nêr e, pêrî mêhê ye û yê lihevketî pirtir cin in. Wêdetir, cinên rind û yê xeraw hene. Navê cin û pêrî, şor û gotinên li ser hebûn û kirinên wan ketine nav zî-manê kurdî. Di kurmancîya gundê

Xelika da ji bo vê pir nimûne hene:

**Bi cina ketin:** Ew î bi cina ketiye. Va bi meneya dînbûn, ji rê derketinê dihê gotin. Carna jî ev, gava kesek pir tirsîya yan jî ji ber hediseyeke bi xof yan nepayî dilqetî dibe, dihê gotin.

**Cina pê va dan:** Cina pê wî va daye. Va jî bi meneya cina li wî xistiye, yan jî cinên li wî peyda bûne û ew î pê nexwaş ketiye, dihê gotin.

**Cinên min rameke:** Gava ku meriv ji ber tişteki pir eciz dibe û hêrsê wî radibe, dihê gotin.

**Cinû bûn:** Bi meneya pir tirsînê dihê gotin. Nimûne, gava ku ew bi şev di newala pîra merxûrî ra derbas bû, pir tirsîya, cinû bû.

**Serbicin yan jî kurbicin:** Va jî di hing û şeran da wekî zihêf dihê gotin, bi armanca kû yê rikeber pê bihê eşandin. Nimûne, «Magî serbicino » yan «Mageyî kurbicino».

**Wekî cin e:** Ji kesên jîr, çapik û dest-sivik yê ku destpêyên wan rind li kar û xebatê dihên ra dihê gotin.

Nexwaşîyên bi nişanên esebîyê yan şîzofrenîg jî dikirin derîyê cinan. Li gor bawerîya hingê, kesên ku bi nexwaşîyên esebî diketin, dibirin

ocaxan, ba mele, şêx û xoceyan, jê ra nivîst çêdikirin û bi stû yan binçengê wan va dikirin. Carna jî yên ku pît nexwaş ketî, dikirin xanîyekî derîlêgirtî yan jî ew girê didan û lê dixistin. Îro jî, her çiqas ku tesîra xwe kêm bûye, hîn bi hebûna cinan, kar û kirinên wan dihê bawerkirin. Heta meriv li welatên Ewropayê jî, li ba koçberên kurd raste xwedîyên nexwaşên şizofrenîg dihê yên ku ji bo xwaşkirin û dermankirina nexwaşên xwe diherin ba mele û xoceyan.

Rojekê li bajarê ku ez lê dimêm, bi dostê xwe, Miçê Bekir va li qehwekî rûniştibûn, me sohbet dikir. Bi çî minasebetê bû nizamim, qal hate ser cinan. Miço bixwe raste cina hatiye û wî çend serpehatiyên xwe û yên nasên xwe ji min ra kat kirin. Dixwazim vê sohbetê pêşkêşî xwendevanên Bîrnebûnê bikim.

Miçê Bekir 67 salî ye, 45 sal in ku li Almanyayê dijînê. Li çend bajarên Almanyayê kar kiriye û li ser paşîyê 34 salan di Firmaya Opelê ya li Rüsselsheime kar kiriye. Niha teqewud e û bi malbata xwe va li Bajarê Mainzê dimê. Ew î jî Gundî Omî Gordê ye (Bi tirkî: Gördöglü–Zincirlikuyu–Kulu). Min gotinên Miçê mîna ku wî deng kiriye, yanê bi zaravayê gundê wî nivîsandin.

**Nuh Ateş:** *Miço, tu bawer dikî ku cin hene û ew çing xwe bi meriva dinimînin?*

**Miçê Bêkir:** Erê, ez îna dikim ku cin hene. Ew ê ên pir tikevine tonî însan û heywana, weng xwe bi însên dinimînin.

**Nuh Ateş:** *Li ku derê meriv pir raste cin û pêriyan tê yan dihat ?*

**Miçê Bêkir:** Li ser kulingan, li xerewan, li ber avan, li ser kanîyan cin û pêrî hene. Digotin qalikê pîzavan zêrê wan in.

**Nuh Ateş:** *Cara pêşî, tu kîngê û li ku derê raste wan hatî ?*

**Miçê Bekir:** Ez î li Yaylê Ele Kwîrê terime berxa. Salê min deûçar in. Siwe da, royê helatiye, min nanê xe dixar. Nanê mi jî du hêkê kelandî ne. Mi yek şikêna ku pê qozîkî bikim, çî mês kim, çêle jê viderket. Mi temel li a di mês nekir. Paşê gotin, ew heka hol e, ew ê pir maye, loma. Di wî devî da, mi mês kir ku Omîkî li kerê nîştîye di wir ra derbas tewê. Ez bervê çûm, mi go, Omo herî ku siwe da zû, ro hîn nû helatiyê. Go, ez î herime Qulekê (Kulu). Lo mi go, terî Qulekê xerê, ji mi ra çokî wune, ez ê ji ber va pera bi te dim. Go, ez ê ji te ra wûnim, ku ez hatim tê pera bi mi dî. Lo mi go, pera heyne, go, na, î min çav nakê terê.

**Nuh Ateş:** *Ew kê ye, ew ê ku Omê çav nake dihere, henne ew cin e?*

**Miçê Bêkir:** Erê erê, mi paşê tê anî derê ku ew cin e.

Ez dastîm, pêçek nekete naberê, ez nî li ferqê bûm, mi mês kir ku Omik cîlê com bû. Lo mi go, va çi zû çû, paş neqewê da hêlbû. Omik çû şûva, mi berx birin yaylê, saet dehe wûn. Wexta ku ro helat saet heft wûn. Min berx li yaylê teslîm kirin, ez çûme gund. Navberê gund û Yaylê 2 km ne. Gundî isiz (xewle) e. Gundî ê terine yayla, lê heval û hemsalê min ê li gund in. Koşkarekî gundî me hewû, wî bi rû koşkarî da tişt jî difort. Em ê terinî bi dên jê tişt distînînî, li ser defterê malê. Em ê jê erîga, tirî û tiştê din distînînî û navî xe jê ra heldininî û tewênî li defterê qeyid ke. Ez çûm ba koşkêr, mi mês kir ku Omkî li wir ê. Lo, mi go, tu neçûyî Qulekê? Go, Quleka çi ye, ez î ji Şikurê tême. Şikur yayleke din a li jêr gund e. Mi go, ne tu siwe da diçûyî Qulekê. Go, lo tu diwêyî çî!? Mi go, tu bi çi hatî? Go, ez bi çi hatim, ez peya hatim. Mi go, kera wê li ku ye? Go, kera me ê li Şikur e. Ez êdin tirsîm.

**Nuh Ateş:** *Yanê cin ketibû tone (drûvê) Omê?*

**Miçê Bekir:** Erê la!...

Bavkê mi qal dikir, li gundî me

zemanê berê aş tune wûye, diçûne Xelikê Jêrî, li wir aş hewûye. Bi kera diçûne, her malekê li gore ihtiyacê xwe, dengê yan du deng genim dibirine. Xelikê Jêrî ji gundî me dûr e. Loma bi rê da dadiwestîne, şev li çolê derbas dikirine. Bavkê mi bi tenê wûye, digo, ez ji êş vegeyriyam, bi rê da ku şev bû, mi li wê çolê bare xwe ewirand. Kuçikê me yî reş, Qerebaş jî li ba min e. Digo, mi mês kir ku ew hatin (yan cin hatine) û arê sîngsîngê dadan, govend gerandin, paşê hatin vi Qerebaş ra gotin, rawe di govendê keve. Digo, vi Qerebaş ra digotine Şûmo. Digo, Şûmo gotiye ew î payî ye ( ji bo bavê Miçê). Digo, gotine na na rawe, ew î raketiye. Bavkê min derew nedikirin, sond dixar digo, Şûmo rawû kete serî govendê heta siwê govend gerandin. Digo, ez heta siwe da ranemedim. Digo, dora dine rê em hatin gihêştin binî gund, min li Şûmo mês kir go, Şûmoyî Reşo, te heta siwe da serê govendê nedida kesî. Digo, Şûmoyê mê cîhlê com bû, me careke di ew nedî.

**Nuh Ateş:** *Yanê Qerebaş î ji wan bû?*

**Miçê Bêkir:** Erê.

Carekê jî birê min î piçûk li Qolita (Yayla Xelikê Jêrî) terê berxên birayê me yê mezin. Wî qal dikir, diwê şev bû, mi berx kirin hêvşo. Gavek neçû, mi mês kir ku dengê cewrayî

tê. Diwê mi eltîrîka desta vêxist, mês kir ku nêzika si-çel cewrî di tolîka şivana da ye, ê li sê hev dinine. Diwê ez tirsîm, dua dixunime, pore serî min î tela bi tela bûye. Diwê, siwe da, birayê min î mezin hate şûna min. Birayê min î mezin jî diwê, wê rojê, bi nîvê şevê dol-zurnekê ledikeve, guhê min ê ku biteqene. Diwê, mi klav li xwe pêça, paç kirin guhê xwe lê fêde nekir, tê bêyî ê di hindurê guhê mi da lêtêxine. Diwê, radyoke piçûkê li ba min e, wê vedikime ku dengê wan neyê min. Diwê heta siwe da hundir li min qetî, dua bixwine ha bixwine, tu fêde newû. Diwê, siwe run bû, mi berx dane ber xe di yaylê me ra viderketim...

Careke kê jî, hîn salê mi deh û dehûdudu ne. Li naberê Yaylê Elekwîrê û gundî me Xweliya Gewr heye, şûneke bi tirs e. Rokê ez di wir ra derbas dibûm. Mi mês kir ku glokekê ketiye pê mi, ku dadiwestim glock jî dadiwestê, ku terim ew jî di dû min tê. Zati digotin, zexerekî li wir e, rivikî li wir e...

**Nuh Ateş:** *Çi ye va? Însanê wî zemanî ji bo vê çi digotin, çing mitale dikirin?*

**Miçê Bêkir:** Hîngê digotin kebs e. Kebs ê di xewê da digre ser meriya, nefes ê li meriya teng dike. Lê va ne kebs wû. Kebsa çi ye, ro wû, ez nî di xewê da bûm, mi bi çavê xe tedî...

Carekê jî, ez î, bi du kesên di va, li Încovê bi motir (trektor) cot diajome, em ê hêrga dîkinî. Em ê bi dorê diajonî. Wê rê min bi ro ajot, bi şev jî her du hevalê mi ajotin. Bi şev mi xe li ser remorqî motir dirêj kir ku rakevim. Hîn neketime xewê. Cîlê li ser nigê mi yek rûnişt û henbihen berve zikê mi dihat, giran e, mi go î ku mi biteqînê. Mezinê hîngê digotin azanê, duayan bixwînî cin ê ji ser birevin herin. Mi tu azan û dua nehîştin, gî di ber xwe da xandin, lê dîsa jî ew nerivî, ji ser mi neçû. Cin jî îşqê hez nakin. Hevalên mi bi motir çerx bûn, berve hêla mi hatin, ku îşqa çirê motir nêzikî mi bû, ew ji ser mi rawû, mi cîlê xe avte herdê. Hevalê mi hatin, mi go, hun ji Xwedê natirsîn, mi li vir dikine xewê !...

**Nuh Ateş:** *Miço va cinîna çima li vir, li Almanyayê raste te nêne yan jî qet li vir raste te hatin?*

**Miçê Bekir:** Na li vir qe raste mi natin. Li vir îşq pir e. Ku îşq pir bû ew nên, li bajaran îşq pir e, îşq. Xoceyekî nas jî vi mi ra go, derê ku îşq lê pir bû cin namên ê wî dîyarî terk bikin...

**Nuh Ateş:** *Hîn serhatiyên din ên bi cin û pêrî di tûrikê te da hene ?*

**Miçê Bêkir:** Carekê jî ez ji yaylê bi şev hatim gund ku dergîsta xwe biwînîm. Gundî xewle wû. Erew

(navê merikî ji gund e) cîlê li ber devî mi derket, go herî ku? Mi go tu dizanî ku ez î herime ku, ez î herime mala xezûrê xe. Lêbîlem ew î vi mi ra jî tim diwê, çi tu berve mi têyî, berve mi mê. Tabî ez î nizanime ku çima wer tewê, ez î diwême ev Erew e. Ew dera jî xewle ye, pir kesên din jî li wir cin ê dîne. Hîngê ez î hînnû ji eskerê hatime, mina ku tewên, qerewane î li sêrî mi xistiye, natirsime. Ez çûm ber deriyê dergîstê, lê xasîyê ez nekirim hundir. Ez vegeyîyam çûm yaylê. Bi rê da, ji xeberê du kuçik li mi pêda bûn, kuçikê şivana. Ew ji derî mi newûn, ê weng têne ser mi, tê bigota ê ku mi bixwine. Tûrekî cawinî yê şekir, î bêtal e, di dest mi da ye, ez î bi turik li ber xwe didime, pê li kuçika dixime ku ma nêne ser mi. Kûçika ez gêrkirim, di piştê mi ra girtin. Lê çi hîkmet e, ne dereke mi dirandin ne jî ez bi birin kirim. Dora dine rê, siwe da ez hatim gund. Mi ji Erew ra qala vê meselê û rasthatina min û wî kir. Erew go, na, mi tu kîngê dîyî?...

Xocekî ku ez rind nas dikim qal dikir. Digo, xoceyê mi terleke xe hewûye lê nîsk dirîşandine, ku wextê xwe dihatiyê, nîskê xe bi cinan diçîniye. Carekê jî hîn nîskê wî hêşin wûne, cin di wir ra derbas dibûne, jî xebixe ra gotine, ku çîng hê, xocê rokê sewa çînîne bane meke, madem

em ê li hêla terlê nîskanî, ku em wan biçîninî. Cina nîsk bi hêşinî çînîne...

Ez yeke di jî kat kim, bes e. Li gundî me Ewo hewû, bi cina ket. Digotin î bi cina ra zewicîye. Jinika xe ya rast va cihîşt. Ewo dused pezî xe î nêr hewû. Li ser rêya Xelika Fatmehîn\* ê raste wî hatiye. Fatmehînê porî bi xurra dikişê. Wê pêşî li yên ku di wir ra derbas diwûn dibirîye. Ewo î bi şev li wê derê bi tirs, di naberê gundî me û Xelike Jêrî da radikeve. Li wir Fatmehîn lê dibe bela. Ewo bi porê wê digre, bi çu li ber diskine. Wî bi xe qal dikir, Fatmehînê vê ra gotiye mi berde, ez qet nêsike sulalê te nawim. Wî ew ê bernedaye, lêxistiye. Bi Bayê Fatmehînê Ewo nixaş bû. Ez Ewo rind nas dikim. Sala 1968an ez î terime pêz. Pir westiyame, ji piştê kerê dênême. Çêre tune, pezi ûzerliga dixwê. Ewo jî pezê xwe diçêrînê. Pezê wî li kêlekê zevîya ketiye rêzê, lê yekê jê nakevê zevîyê. Ewo jî ji xe ra rûniştîye, cixarê dipêçê. Ez çûm herdê, mi go, xalo pezi te çima nakevê zevîya? Go her yekî yekê dipê (Yanê cin ê wan dipêne). Bi çêbûnê, pezi Ewo di ser yê gîya ra wû. Ewo î pir cêmêr wû, kesî nediwêrî ku xe tê bide. Ew bi cina ra zewicî wû, paşê cina ew vetisand. Yekî gundî me î şivan e, peyizi tere yaylê, mês

dike, pezî nêr ê bikal e, ku pezê nêrî  
dikalê, gotîye va peza î birçîye. Tere  
di pencerê gomê ra mês dike ku pezî  
herîya hev dixwe, ku êdin çend ro  
ne ku Ewo miriyê xerê. Hate gund  
xewer da malê, gund gî bihîst, em  
gî çûnî, pezî di gomê da elemaşkere  
herîyê hevdu dixwe. Ewo di gomê da

hîşk bûwû. Xocê gund go, qirikê reş  
bûye, cina ew î vetisandiye...

\*Fatmehîn: Ew ê mîna mehlûqekî  
efsaneyî xuya dikê û wekî ku ji navê  
wî dertê, nîv jin û nîv mehîn e.

Mainz–Almanya, 18.02.2015



## Bibin yek

mala me pûş û dar  
ser serî zarokan mişk û mar  
belengazî hebû  
lê disa jî  
dilên me li eşqa sîwara bûn  
dilê min î dîke  
di destî peşmergan da kelaş û polanîka  
kurên kurdan bibin yek  
keç û bûkên Şengalê  
mekin ji DIAŞ ra bûk.

*Kemal Demirsoy*

# VEGUHERÎN

–Serpêhatîya merivekî ku veguhêriye bûye kêz –

Franz Kafka

*Wergera ji almanî: Nuh Ateş*

Gregor Samsa sibehekê gava ji avrûya xewnên neçê da bi xwe hêsiya, mêze kir ku ew î di nav nivînê da veguherîye, bûye kêzeke gir. Ew li ser piştê ya mîna qalikê tankê hîşk, ketibû. Dema sere xwe hendik helna, wî zikê xwe yê esmer, kumbedkî û bi hîşkîya di dirûvê kevanê da tejbitej bûyî dît. Lihêfa ku li ser pozê zik li ber şemitînê bû û sekinîna wê mimkûn nedixuya, jê va xuya kir. Çîpên wî yên zêdê û li berhemberî yên berê pir ziravik li ber çavan neçar vedilîstin.

“Ma çi bi min hatîye?” Wî ji xwebixwe pirsî. Ev ne xewn bû. Odeya wî ya bi serûbinî, haşt û ji bo merivan tozîkê zêde piçûk, li navbera çar dîwarên rind nas bû. Samsa karê bazirganîya seyar dikir. Çikineke vekirî ya ji pirtû û pêşkîran dagirtî li ser maseyê bû. Li alîjorî maseyê wênekî ku wî berî demeke kurt ji kovarekê rûçikandi û di çarçiveke rindik û zêrkirî da bişûnkirî, hatibû lidarxistin. Wêne banûyeke reprûniştî û bi kûmekî kurkînî yê ku parçek kurkî boamar li dorê peçayî dinimand. Wê parçek kurkî giran yê

ku çepilê wê hetanî henîşkê di binî da wenda bûbû, li ser çepilê xwe berve sêyrdaran helnabû.

Paşê, awira Gregor berê xwe da pencereyê. Li derva hewayaya şêlî ew dîlîzîz dikir. Meriv dengê kutinîya hewên baranê yên ku li tenekeyên kênarên pencerê diketin, dibihîst. Ew fikirî û got, „A çawa bibe, ku ez pêçeke din rakevim û van qerequireyan giştan ji bîr bikim?“ Lê va ne mimkûn bû, ji ber ku ew hubûbû raketina li ser kêlekê rastê. Lê rewşa ku ew niha têda bû rê nedida ku ew li ser kêlekê rastê rakeve. Her çiqas wî hewl dida ku xwe li ser kêlekê rastê bi şûn bike, li dawîyê her car neçar li ser piştê diket. Wî ev belkî sed carî dúbare kir û her carê jî, sewa ku velîstina çîpên xwe nebîne, çavên xwe digirtin. Kîngê ku wî ji kêlekê da destpêkirina êşeke sivik û nedîyar ya ku wî qet nedinasî, hîs kir, hîngê dest ji van hewlan berda.

Wî bi lome got: „Ax Xwedêyo, min mijûlîyeke pir bi meşeqet bijartîye! Bi şev û ro li ser rê bûn.



Teleşeyên bazirganîyê di ser yên bazirganîya esil ya li malê ra ne. Wekî din, mişkuleyên rêwîtiyê jî li ser min dibin bar. Yên mîna eleqedariya bi tîranguhêrînê, xwarinên neçê û ne li wextê û têkilîyên navberê merivan yên guhêrbar, nemayînde û ne jidil. Gîşt di erdê reş kevin! “Li jorî zik xûrekê sivik lî wî peyda bû. Sewa ku bi şîya bike serê xwe berjor helne, wî xwebixwe li ser piştê giran berve singên nivînê kaş kir. Wî şûna ku dixurî dît ya ku ji deqên hûrik û spî tijî bûbû yên kû wî nekanîbû tê bideranîya, ka ew çî ne. Û wî xwast ku çîpeke xwe li ser wan bigerîne, lê bi lez ew bi şûnda kişand, çimkî bi pêkirina çîpê tavên sarîyê lê peyda dibûn.

Ew xûşî û vegeirîya şûna xwe ya berê. Wî xwebixwe fikirî û got, „Va zû jixewrabûna heye, ew ê meriva dîn dikê. Divê meriv têr xewa xwe helne. Bazirganên seyar yên din ê mîna jinên di hareme da ne. Nimûne, gava ez danê sibê sewa qeyîdkirina temeyên ku hatina wergirtin, vedigerim xwaringehê, dibînim ku ew ê hîn li ser sifreya xurînîyê ne. Ku min vava li ba serdarê bazirxaneyê biceribanda, wî ez ê tavile biqewitandama. Bi rastî kî dizane, belkî eva ji bo min pir bikêr bibûya. Dêûbavê min nebûyana,

niha min zûda dest ji kar berdabû. Ez ê derketama pêşberî serdêr û min ê jê ra merama xwe ya ji dil bigota. Ew ê pê ji ser kursîyê da biketa. Li ser kursîyê û ji jor da bi xizmetdarê ku di bin fermanê wî da dixebite ra dengkirin terzeke ecayîb e. Bi ser da jî xizmetdar, ji ber ku guhê serdêr kêr dibihîstin, mecbûr dima ku pir nezîkî wî daweste. Niha, omdî bitûn nayê birîn, carekê peren di dest min de bigehin hev, vîqasî ku pê dêynê dêûbavên xwe bidim, -ev a qedera pencûşeş salan bajo- hetanî hingê ez ê bê kemûkum li ser kare xwe bimê. Paşê gaveke mezin dê bihê avêtin. Lê niha divê ez rabim, çimkî li saet pêncê tîrana min ya bi rê keve.“

Û wî berve bansaetê ya ku li ser kodikê lédiket mêze kir. „Bavê ezmanî“ di ber xwe da got. Saet şeşûnîv bû, û gêçên wê hêmîn berve pêş diçûn, heta ew ji niv jî derbas dibû û nêzikî panzdeh kêrî hefta bûbû. Ma dibe ku bansaet lêneketiba? Ji nav nivînê da meriv didît ku, ew li çaran rast hatibû eyar kirin. Bêgûman ew lêketibû. Erê, lê ma ev mimkûn bû ku meriv ji ber vê dengdana ku mobîlîya pê dilerizî bi aramî di xew da bima? Bi ser da, ew rehet jî raneketibû, lê guman heye ku ew ketiba xewa kûr. Lê divê wî

niha çi bikira? Tîrana din ya li saet hefta bi rê keta. Ji bo ku bigihê wê, divîya bû ku wî pir lez bikira û çikin jî hîn nehatibû bihevda kirin û wî xwe qet hîşyar û çalak hîs nedikir. Ku bigihêşt tîranê jî, ew ji barebarê serdarê bazirxaneyê nedifilitî, çimkî berdevkê bazirxaneyê derîya tîranê saet pênc bipa û bi lez haya derengmayîna wî bigihanda serdêr. Ew nokerê serdêr bû, yekî newêrek û bêfehîm. De niha, ma ne dibû, ku wî xwe li nexwaşîyê naba? Lê vê jî rêya li ber şerm û gumanan vebikira. Çimkî Gregor di xizmetdarîya xwe ya pênc salî da tu car nexwaş neketibû. Şik nîne, hingê serdar ê teve hekîmê Sîgorteya Nexwaşan bihata û ji avrûyê lawê wan î tiral da lomeyan li dêûbavan bikira. Wî gîşt bahane û dijberî jî ê di saye hekîmê sigorteyê da yê ku li ba tenê merivê têr sihetxwaş lê karnehez hene, pûç derxista. Bi ser da, ma di rewşeke ha da ew ê neheq bihata hesibandin? Bi rastî, Gregor ji xeynî xilmaşîyeke fizûlî li pey xeweke dirêj xwe pir baş hîs dikir, heta pir jî birçî bibû.

Gava wî vana gîşt bi lezgînî di serîyê xwe ra derbas kirin, bêtî ku kanîba biryarek bida, ku pê ji ciyê xwe rabe, hingê bansaet li dorê ji hefta panzdeh kêr lêket û ji alîyê binlingê nivîna wî da, derî sivik hate

kutan. „Gregor,“ dêya wî bi dengê nerm bang kir û got, „Saet ji hefta panzdeh kêr e. Te nedixwast bi rê kevî?“ Gregor veciniqî, gava ku dengê bersiva xwe bihîst. Bêşik ev dengê wî yê berê bû, lê ji alîyê binî da tonekî çîveçîvkî û êşdan yê ku meriv nedikanî pêşî lê bigirta, tevê dibû. Û vî tonî, di sêrî da, bîstekê dihîst ku peyv zelal bihên bihîstin lê di pey va, dengvedana wan wer xerav dikir, meriv pê nedizanî ku wî ew baş bihîstine. Gregor xwast biserûber her tiştî şîrove bike, lê li dawîyê, di vê rewşê da, xwe bi gotina „Erê, erê, canê te sax be dayê, aniha ez radibim!“ sinor kir. Ji ber derîyê darinî, ji derve da veguhêrîna dengê Gregor nedihat kêvşkirin. Ji ber vê, dêya wî bi gotinên wî hêmin bû û ew kişandin hundirê xwe. Vê kurte danûstandinê bala merivên din yên malbatê kişand û ew, wekî xuya ye, pê hêsiyan ku Gregor hîn li mal e. Di wê demê da, bavê wî giran lê bi mistê li derîyê li tenîştê xist. „Gregor, Gregor“ wî bang kir û got, „Çi qewimî?“ Û li pey demeke kurt dîsa bi dengê qalîn û bibîrxistî got, „Gregor! Gregor!“ Li ber derîyê li tenîsta din, xwanga wî giran gilî kir û pirsî: „Gregor? Tu nexwaş î? Arûzûyeke te heye?“ Gregor berve her du derîyan bersiv

da û got, „Ez amede me!“ Û wî hewl dida ku bi rêya dengdaneke pir bi îtina û navberdayîneke dirêj ya di navberê peyvan da, guherînên dengê xwe veşêre. Bav şûnda vegerîya cihê xwe yê taştîyê, lê xwangê bi pistepistî got, „Gregor dêrî veke, ez di dorê!“ Gregor qet dil nebû ku dêrî veke. Li şûna vê, wî bi pesne balkişand ser îtinaya qeymgirtina derîyên malê bi şevan jî. Wî va li rêwîtiyê hukiribû.

Gregor xwast berê giran û bêyî ku bihê ecizkirin rabe û kincê xwe li xwe bike û di ber her tiştî taştî bike û paşê mêyla xwe bide tiştûmiştên din. Wî êdî fehmkiribû ku, ew bi fikirîna di nav nivînê da nikane bigihê encameke maqul. Wî dianî bîra xwe, pir caran gava ku wî xwe di nav nivînê da dirêj fikir, belkî ji ber bişûnkirineke neçê be, êşeke sivik hîs fikir. Lê paşê, wexta ku ew ji nav nivînê radibû ser xwe, êş nedima û wê xwe bitûn mîna weswesekê dida niman-din. Û wî meraq fikir ka tesewurên wî yên îro ê çawa pêdapêda ji hev bikevin. Şika wî qet tune bû, ku guhêrîna dengê wî ji nîşana destpêka sermalêketineke, ango nexwaşîyeke meslekî a bazirganên seyar, bitûn bêtir ne tiştêkî din e.

Avêtina lihêfê ji ser xwe pir hêsan bû. Ji bo vê, divîya bû ku wî xwe tozîkî biperçifanda, evqas û lihêf bixwe

ket. Lê dîsa jî astengî hîn hebû, ji ber ku ew î pir biber bû. Sewa ku rabe, pêdivîya wî bi dest û pêyan hebû. Lê şûna van, pir zêde çîp û ranên wî hebûn yên ku bînavberdayîn vir da û wê da vedilistin û wî nedikanî wan zept bike. Wî carekê yek ji wan bada, ew veng bû yê pêşî yê ku xwe vekişandî. Û nihayed wî dikanî bi vê çîpê bigiheşt armanca xwe. Çîpên din jî, gîşt bi vî awayî, mîna ku ew serbest hatibûn berdan, bi heyecaneke mezin û eşbar dişuxilîn. Gregor li xwe vegerî û got, „Qet di cîyê xwe da betal û bêxîret daneweste!“

Di seri da, wî xwast ku bi nivê jêr yê bedena xwe ji nav nivînê der-keve. Lê jêrbedenê, ya ku wî hîn nedîtibû û derheqa wê da ew ne xwedîyê pêşbînîyeke bû, xwe da xuyandin ku ew a pir bi zehmet bihê livandin. Her tişt giran dimeşîya û gava ew êdî nêzikî harbûnê bûbû, bi hêzeke berhevkirî, bêyî ku tiştêkî li ber çavan bigre, wî xwe berve pêş le-qand. Lê wî hedef şaş bijart û pir pît li singê nivînê yê jêr ket. Bi êşeke bi şewat ya ku li wî peyda bûbû, ew pê hêşîya ku jêrbedena wî di vê bîstê da belkî yê hesastir bû.

Loma wî hewl dida ku berê jorbedena xwe ji nav nivînê derbixe û sêrî bi dîqet berve kênarê nivînê vegerîne. Ev bi hêsanî hate şûnê û li

dawîyê, tevahîya bedenê bi giranî û ferehîya xwe va, xwe li serî girt. Lê gava ku wî serî nihayed li derî nivînê li hewa girt, ew tirsîya ku bi vî awayî berve pêş here. Ji ber ku, eger ew di vî halî da biketa erdê, divê mucizeyek biqewimîya, da ku serîyê bi birîn nebûya. Divîyabû ku ew vê gavê, bedel çî dibe ma bibe, dêst ji heşlisêrîtîyê bernede. Bi dilê wî bû ku di nav nivînê da bimê.

Lêbîlem, gava wî xwe li pey berxwedana dubare bi ofûpof li nav nivînê mîna berê dirêj kiribû, dît ku çîpên wî dîsa, gûman hebû, ji ya berê zêdetir li ber hev didine û wî tu mecal nedidît ku vê tevlihevîyê vegerîne ser aştî û rêkûpêkîyê. Dîsa ji xwebixwe ra got, ne mimkun e, ku ew bikane di nav nivînê da bimîne û di cihê xwe da ye ku, hêviyeke piçûk be jî, her cure bedel bihê dayîn, ku pê ew ji nav nivînê derbikeve. Di vê demê da, wî ji bîr nekiribû ku carcaran bîne heşê xwe ku fikirên hêmin ji biryarên dudilî bikêrtir in. Di demên ha da, wî çavên xwe yên belkîrî berdidan pencereyê. Lê çî heyfe ku mîja sibehê ya ku dagirtibû ser hêla din a cadeyê jî, bi ber çavan diket û ji nihêrîna li wê, kêma omdî û şahî derdiçû. Bi lêketîna bansaetê a ji nûva, wî got, „Saet bûye heft“ û da ser, got, „Saet bûye heft lê hê jî mij-

ke ha!“ Bi dirêjîya bîstekê ew hêmin û bi nefeshelnaneke bêhêz di cihê xwe da ma. Te yê bigota qey ew î ji têrbedengîyê vegerîna pêwendîyên rasteqîn û xwezayî dipê.

Paşê, ji xwebixwe ra got: „Hîn ku bansaet li çaryek kêma heyştan lêneketîye, divê ez mutleq nivînê terk bikim. Ji xwe hetanî hîngê, ji ber ku bazîrxane berî saet heftan vedibe, yekê ji bazîrxaneyê bihê û li min bipirse.“ Û wî destpê tevdêrîyê kir û hewl da ku bedenê bitûn li ser dirêjahîya wê bi çengandin ji nav nivînê biderîne. Eger wî bi vî awayî xwe ji nav nivînê da berda erdê, guman hebû ku serî, ji ber ku wî ew ê di dema ketinê da pir bi îtina helbigirta, bê hesar bima. Piştî wî xwe hîşk dida mêrandin, loma bi ketina li ser xalîçeyê, mimkun bû ku tişteke pê nehê. Ew kete şik û dudilîyeke mezin ji ber dengdana bilind ya ku bêguman bi ketina ser erdê derketa û li paş derîyan rê li ber xofan, kêmtir xeman vekira. Lê divê ev bihata ce-ribandin.

Gava Gregor hetanî nîvî ji nav nivînê derket, –ev metoda nû ji zehmetîyan pirtir mîna listikekê bû, divîya bû wî hemle bi hemle xwe kaşkîra– hate heşê wî, her tişt ê çiqas hêsan bûya, eger kesek bihata hawara wî. Du kesên bi quwet, bavê

xwe hata bîrê û keçika xizmetkar, her du bes bûn. Wan dikanîn tenê çepilên xwe bidana bin pişta wî û bi vî awayî ew ê ji nav nivînê biderxistana û bi barê xwe va li ser çokan ber ve erdê xwar va bihatana û bi diqet bisekinîna, sewa ku ew bikane bikeve ser erdê, bi hêvîya ku çipikên wî êdî bikanin bibin xwedî wateyekê. Ji ber ku derî gîşt hatibûn bendkirin, ma ev a biba ku wî bikira hawar? Di nav evqas tengîyan da, wî bi şîya nekir ku sivikkenê xwe yê bi vê fikrê bigirta.

Bi hewldana xwe ew gihêştibû wê merheleyê ku, bi çengandinên pît ra, parastina hevsengîyê bi zehmet biba. Divîya bû ku wî zûtir biryara dawî bida, ji ber ku ji saet çaryek kêmî heyştan ra pênc deqîqe mabûn. Di wî devî da, zengilê malê lêket. „Ev kesekî ji bazirxanê ye“ Gregor ji xwebixwe ra got û mat bû. Çîpên wî bilêztir vedilîstin. Bistekê her tişt kerûlal bû. „Ew venakin,“ Gregor di ber xwe da got, wekî hêsrê hêvîyeke bê wate. Lê paşê, keça xizmetkar bi gavên pît çû ber dêrî û ew vekir. Divîya bû ku Gregor tenê dengê silava yê ku li zêngil xistî bibihîsta, ê hema tê derbianîya ku ew kî ye. Ew berdevkê bazirxanê bixwe bû. Ma çima tenê Gregor mecbûr bû di firmayeke ha da kar

bikira, ya ku ji avrûyê xemsarîyeke piçûk da hema dikete şikê? Ma xizmetdar gîşt tevhev qenere bûn û di nav wan da qet merivekî sadiq tune bû, yê ku gava çend saetên sibê ji bo bazirxaneyê feda nekiriba, ji ber nerehetîya wîndanî ne li ser xwe biba û nekanîba nivîna xwe terk bikira? Ma bi rastî bes nedibû ku ji şagirtêkî li ber hinbûnê bihata pirsîn, ger ev pirsînên li ser hev pêwîst bûna? Ma berdevk mecbûr bû ku bixwe bihê û bi vê rê bi malbatê gîşt ya bêguneh bihê nimandin, ku lêkolîna vê dozê bişik tenê karibû amenete fehmkirina berdevk bihê kirin? Û ne wekî encama biryareke rast, pirtir ji ber heyecanê ya ku ji avrûyê van fikirînan li Gregor peyda bûbû, wî xwe bi hemû hêza xwe ji nav nivînê çeng kire der. Wexta ku li erdê ket, girminîyek bi ser ket, lê ev vîqasî ku Gregor dipa ne dengdan bû. Di saye xalîçeyê da deng kêmbelav bû. Pişta wî ji tehmîna Gregor zêdetir elastîkî bû, ji ber vê jî tîna dengê ketinê kêmbû. Lê qasî ku pêwîst bû wî serî bi dîqet negirtibû û ew li erdê xistibû. Wî ew vegerand û ji ber hêrs û êşê di xalîçe dida.

Di odeya li tenîştê çepê da, berdevk got, „Aha, li hundir tişteket ket.“ Gregor dinihêrî ku bîne ber çavên xwe, tişteki wekî yê ku îro hatibû

serîyê wî, rojekê belkî bihê serîyê berdevk jî. Divê meriv mikur bihe ku imkana bûyîna vê heye. Lê wekî ku xambersiva vê pirsê be, berdevk aniha di odeya li tenîştê da çend gav avêtibûn, û dihîşt ku cîzmeyên wî bikin çîrkeçîrk. Xwangê sewa ku Gregor hayadar bike, ji odeya li tenîştê rastê da bi pistepistkî got, „Gregor, berdevk hat.“ „Dizanim“ Gregor di ber xwe da got, lê bi dengêkî biqasî ku xwang bikane bibihîse û ne dihîşt ku dengê xwe bilind bibe.

„Gregor,“ bavê ji odeya li tenîştê çepê da bang kir û got, „Berdevk hat û dipirsê ka çima tu bi tîrana sibê zû bi rê neketîyî. Em nizanin jê ra çî bibên. Wekî din jî, ew î dixwazê bixwe bi te ra deng bike. Loma kerema xwe dêrî veke. Ew ê qusura tevlihevîya li odeyê bibaxşîne û ew ê veqas rindîxwaz be.“ „Roj baş Samsa ê Mîrza,“ berdevk di navberê da bi dengêkî nazîk got. Hîn bavê li ber dêrî deng fikir, dêya wî kete navberê û ji berdevk ra got: „Halê wî ne rind e, halê wî ne xwaş ê, bawer bike Berdevk ê Mîrza. Ne weng be, Gregor ê çawa ne gihêştiba tîranê! Di serîyê xort da ji kar bêtir tiştê tune! Ez hêrs dibim ku ew çima êvaran qet nahere derva. Niha ev bûn heyşt roj ku ew li bajêr e, lê her êvarê ew li mal bû. Li ba me, li ber maseyê rûdine û

bêdeng rojname yan jî nexşerêyan dixwîne. Ew bi mijûlîya qewartina parçetexteyan xemrevî dibe. Nimune di nava duûsê êvaran da çarçi-veke piçûk qewart, hunê li hember rindîya wê heşmetkar bimên, ew ê li odeyê bi darda ye, ku Gregor derî vekir hunê bibînin. Wekî din, ez pir bextîyar im ku hun li vir in, Berdevk ê Mîrza. Me bi tenê serî xwe bi şîya nekir Gregor qane bikin ku ew dêrî veke. Ew î pir bi înad e û bêguman xwe rind hîs nakê, lê dîsa jî wî vê sibê ev red kir.“ „Aniha ez dihêm,“ Gregor giran, bi dîqet bersiv da û sewa ku her gotineke şewrê bibihîse xwe nelivand. Berdevk got: „Xanim a Dîlovan, ez nikanim bi awayekî din şîrove bikim û bi omdî me ku ne tiştêkî cidî ye. Ji alîyê din va, divê bihê gotin, ku em merivên bazirgan –ku meriv çawa bixwaze, mixabin yan ya Xwedê– divê nerehetîyeke sivik sewa xatirê pêdivîyên bazirganîyê mecbur bi hêsanî derbas bikin.“ „Wekî ku te bihîst, ma Berdevk ê Mîrza dikane bihê ba te?“ Bavê bêsebir gote Gregor û carek din kuta dêrî. Gregor lêvegrand, got, „Na!“ Li odeya li tenîştê rastê xwangê dest pê îskeîskan kir.

Ma çima xwang neçûbû ba yên din? Ew hîn nû ji nav nivînê rabûbû û wê hîn dest bi lixwekirina kincan

nekiribû. Û ma ew çima digirî? Ji ber ku Gregor ranebû û derî li ber berdevk venekiribû, çimkî ditirsîya ku ew ê ji kar bihê dûrxistin û serdar ê ji bo kevnexwastekan dîsa bi pîstê dêûbavên wî bigirta? Ev fikaran di vê demê da ne hewce bûn. Gregor hîn li vir bû û qet ne dihizirî ku malbata xwe cihbihîşt. Di vê bîstê da, ew li ser xalîçeyê bû û tu kesî yê ku di rewşê deranîba, bi cidî ji wî nedîpa ku ew berdevk berde hundir. Lê ji avrûyê vê bênezaketîya piçûk da, ya ku paşê jê ra sedemeke guncaw bihata dîtîn, ne di cih da bû ku Gregor hema bihata bidûrxistin. Ji Gregor va weha dixuya ku ya di cih da ew e, ku ew niha wî rehet bihêlin, bi şîn û libergerînan nefesteng nekin. Lê ev nediartîya bû, ya ku yên din dikire tengîyê û tevgerîna wan dida baxşandin.

„Samsa ê Mîrza“ berdevk bi dengêkî bilind bang kir û got: „Ma çi diqewime? Di odeya xwe da, we dor li xwe girtîye û hun tenê bi erê û na bersiv didin û dêûbavên xwe di nav xemên giran û fizûlî da cihdihîlin û dêst ji —li vira şûna gotinê ye— berpirsyarîya xwe ya li cihê kar, bi rastî bi awayekî nedîtî berdidin. Ez li vira ji ber dêûbavên û serdarê we va deng dikim û vê pêçê, pir cidî ji we salixdaneke zelal tika dikim.

Ez hayred dikim, ez hayred dikim. Min hun mîna merivekî heşgihêstî û hêmîn dizanî, lê niha hun xwe weha dimêrînin, mîna ku hun ji nişkava bixwazin dest pê fişalan bikin. Serdar îro sibê şîroveke muhtemel, ya ku li ser wergirtina pereyan ya emanete we kirî, nîşanî min kir. Ez hemahema bi şeref sond dixwim ku va şîroveya nikane rast derkeve. Lê niha, gava ez serhîşkîya we ya dûrî têgihêstinê dibînim, ji avrûyê wê da, qet tu arûzû li ba min namînin ku ez sewa we tiştêkî bikim. Û meqamê ku hun li ser in, ne evqas saxlem e. Di destpêkê da, nêta min hebû van gîşt di rûbirûbûnekê da ji we ra bigotana. Lê ji ber ku hun li vir zemanê min di arê da berdidin, nizanim, ma çima dêûbavên we jî pê nezanîbin? Karûbarên we li demên dawîyê ne serkevtî bûn. Her çi qas ku ne demsala xwe be jî, em vê li ber çavan digrin, demsaleke ku lê tu karên bazirganîyê yên xas neye kirin qet nîne, Samsa ê Mîrza, divê nebe jî.“

„Lê belê, Berdevk ê Mîrza,“ Gregor bi halekî jixweçûyî lêvegerand, di vê teleşê da wî her tiştê din ji bîr kir, û da ser, got: „Ez hema, aha vedikim. Nerehetîyekê, sergêjîyekê nehîşt ku ez rabim ser xwe. Hîn ez di nav nivînê da me. Niha ez dîsa li ser xwe me. Aniha ez ji nav nivînê



dadikevim. Tenê bîsteke piçûk sebir! Hîn ne pir baş e, wekî ku min dixwast. Lê êdî ez î rind im. Çawa eva ji xafil da bi serê merivekî da bihê xwarê! Hîn duh êvarê ez pir baş bûm, dêûbavên min jî dizanin. Yan jî rastir, hîn duh êvarê min ev hendik hîs dikir, meriv eva li min bidîtîya. Ma min çima li cihê kar qala vê nekir! Erê, lê meriv tim difikire ku ew ê bêtî ku li mal bimê nexwaşîyê ji ser xwe biavê. Berdevk ê Mîrza, dêûbavên min neêşîne! Ji bo gişt siteman yên ku hun niha li min dikin, tu sedem nîne, kesî li ser van mijaran ji min ra qet tu gotin nekirin. Belkî we temeyên dawîyê yên ku min şandibûn nexwandine. Wekî din, ez ê niha bi tîrana li saet heyştan berê xwe bidim rêwîtiye. Vêşînîya çend saetan bi kêr bû, pê quwet bi min da hat. Qet nepên Berdevk ê Mîrza! Ez ê bixwe jî hema bihêma cihê kar û kerema xwe vê bigihîne wir û min tewşîye serdar bike!“

Û gava Gregor vana gişt bi lez û li ser hev gotin û qet nedizanî ku çi ji dêv derdiket, wî xwe hendik, di saye pêkanîya ku wî ji livandinên di nav nivînê da hukirîbû, nêzikî kodikê kir. Û niha li ber xwe dida ku xwe bi wê bigre û rabe. Bi rastî wî xwast ku dêrî veke û bi rastî xwe bide nimandin û bi berdevk va bikeve nav guftûgoyê.

Wî arûzû dikir ku bizane, ka ew yên ku dixwazin wî bibînin, gava ew bi berçavên wan ket, ê bibên çi. Şayêd ku ew veciniqîn, hîngê Gregor tu berpirsariyê helnane ser xwe û dikanî bihewîya. Na, ku wan her tişt bêdeng qebûl kirin, hîngê tu sebeb namînin ku Gregor xwe biêşîne û ku lez bikira, dikanî xwe li saet heyşt bigihîne Rawestgeha Tîranê. Di pêşî da, ew çend cara ji kodika xûşonek da şemitî, lê bi hemleya dawîyê va rabû ser lingan. Êşên jêzik, çiqas bi şewat bûna jî, ne xema wî bûn. Anîha wî xwe bi ser berpišta sendelîyê da berda û bi çîpên xwe bi kênarên wê girt, weha kontrola xwe bi dest xist û bêdeng ma. Êdî dikanî guh bide ser berdevk.

„We qet şorek fehm kir?“ Berdevk ji dêûbavê pirs kir û got, „Ma henne ew me dikê şûna budeleyan?“ „Xwedê neke,“ dayê bi girî lêvegrand û got, „Belkî ew pît nexwaş e û em wî eciz dikin.“ Wê bang kir, got, „Grete! Grete!“ Ji hêla din da, wêrinî bi ser xwangê ket, wê bang kir û got, „Dayê?“ Dengê wan di nava odeya Gregor ra digihêste hev. Grete gote dê: „Divê tu hema herî ba hêkîm, Gregor nexwaş e, here tavilê hêkîm bîne. Te bihîst Gregor çawa deng dikê?“ „Ev dengê ajelê bû,“ berdevk lêvegrand, bi dengê ku li

hemberî banga dêyê bi nizmahîyê bal dikişand. „Anna! Anna“ bavê ji mabeynîyê da ber ve aşxaneyê bang kir û destê xwe li hev xistin, got, „Bilez here kilîdvanekî peyda bike!“ Hema du keçik bi fistanine jênavê yên ku bal dikişandin, di mabeynîyê ra derbas bûn û derîyê malê bi lez vekirin. Ma her du xwangan çi zû kincê xwe li xwe kirin? Meriv dengê derîgirtinê nedibihîst. Wan ew ji hev cihhîştibûn, mîna derîyên malên ku qeza û belayek hatîye sêrî.

Gregor êdî rind haşt bûbû. Meriv şorên wî fehm nedikirin, lê ji ya berê zelaltir dibihîstin, belkî di saye hubûna guhan da. Êdî meriv pêhêşîya ku tişteki bi wî hatîye, nusqanîyeke wî heye û amede bû ku alîkarîya wî bike. Xwaşbinî û emnîya ku pê tevdêriyên pêşî hatibûn kirin, rind li wî hatibûn. Difikirî ku ew î êdî teve koma meriva dihê hesibandin. Ji hêkîm û kilîdvan, bêyî ku ferqê bike navbera wan, jêhatîyên mezin û nepayî omdî dikir. Sewa ku dengê xwe ji bo hevdiîna giring ya nêzikbûyî zelal bibe, ew tozîkê kuxîya. Lê bi dengêkî nizm, çimkî ihtîmal hebû ku tonê vî dengî jî ne mîna yê kuxika meriva be. Li ser vê mijarê, wî bixwe jî newêrîbû qerarekê bide. Di vê navberê da, bêdengîyê dagirte ser odeya li tenîştê. Belkî

dêûbav bi berdevk va tevehev li dora maseyê rûniştine û dikine pistepist. Belkî jî gîştan xwe danîbûn ber dêrî û guh didan ser.

Gregor xwe bi sendelîyê va giran berve dêrî kaş kir û li wir cihhîşt. Wî xwe avête ser dêrî û li ser pêyan xwe pê girt. Li ser panîyên çîpên wî madeyeke tozîkî nûsîkî hebû. Li pey xîretê, bîstekê ew li wir vêşîya. Paşê, wî destpê kir ku mifteyê bi devê xwe di kilîdê da bade. Wer dixuya, mixabin di eslê xwe da didanên wî tune bûn. Ma wî yê bi şîya bikira bi mifteyê bigire? Lê ji bo vê, ew xwedîyê piduyên pîr pît bû. Di saye wan da, wî mifte bada, lê dîqet nekir ku jê tu zîyanek negihê wî. Loma gilizekî qehweyî ji devê wî da rijîya, bi ser mifteyê da velobû û çilîkî erdê. Berdevk li odeya li tenîştê got, “Hela guh bidin ser, ew î mifteyê badidê!” Vê cesaredeke mezin da Gregor. Lê heqe xwe ye ku her kesî, bav û dê jî cesared bidana wî û bigotina, “Ha Gregor ha, dêst ji mifteyê bernede!” Û bi fikirîna ku her kes bi heyecan çavdêrî li xîretkêşîya wî dikir, çi quweta xwe heye, wî gîşt berehevkir û bi înad, heta dereceyê bîrveçûyîne bi mifteyê û kilîdê girt. Li gorê pêşvaçûnên badana mifteyê, wî di dor kilîdê ra bazdida û êdî bi dêv xwe pê mifteyê digirt.

Li gor hewcedariyê, carna jî ew bi mifteyê da dêdiwist yan jî bi giraniya bedenê xwe mifte badida. Nihayed Gregor rasterast bi tonê zelal yê paşvevegerîna kevanê kilîdê hêsi. Bi nefesberdanê ra, wî ji xwebixwe ra got, “Kilîdvan bi min gerek nebû,” û sewa ku dêrî bitûn veke, serî da ser destikê dêrî.

Ji ber ku wî ji neçarî derî veng vekiribû, bi rastî heta ku heyê derî rind hatibû jihevkerin, lê ew bi xwe xuya nedibû. Çimkî sewa vekirina dêrî, wî xwe ji hêla hundir va bi perê dêrî girtibû û divîya bû ku niha xwe berve hêla din ya perê dêrî biçerixanda û pê ra jî pir dîqet bikira, eger nexwastiba ku bi ketina odeyê ra li ser piştê girm gêr bibûya. Serîyê wî hîn bi vê çerxandina çetin ra mijûl bû û wexta wî tune bû ku bala xwe bida tiştên din. Di wê bîstê da, wî „Wax“ ya ku bi dengê bilind ji devê berdevk derketibû, bihîst. Ahenga wê mîna vîzîniya bayekî şên bû. Û aniha wî berdevk dît, ew î di rêza pêşî ya kesên li ber dêrî da bû û wî destê xwe dabû ber devê xwe, giran xwe paşva dikişand. Te yê bigota hêzeke nexuya û bi tîneke her berdewam pê wî ra dina. Dêya wî ya ku li vira, li ba berdevk û ber ve wî bi porekî ji şeva çûyî da gijbûyî û berjor helatî, dawestîbû. Bi destên li ser hev

û li ber, wê berê li bavê nihêrî û paşê du gav ber ve Gregor avêtin û pê ra di cihê xwe da li ser fîstanê xwe yê ku li dora wê belavbûyî ket. Serê wê weng daketibû ser sîng, te nedizani ku ew heye. Bavê bi nihêrîneke dijminane mista xwe guvaşt, te yê bigota, ew î dixwazê Gregor bi şûnda vegeerîne ser odeya wî. Lê paşê, wî bi halekî ji xwe kêmbauer di odeya mêvanan da li der û dora xwe nihêrî, dest dan ber çavên xwe û girî, girîyekî ku ji ber sîngê wî yê girûpahn dilerizî.

Gregor qet derbasî odeya mêvanan nebû, berevajî, wî xwe ji hêla hundir va qeym bi perê dêrî-yê ku pît hatibû zendkirin girtibû, mîna ku ew jê ra starek be. Tenê nîvê bedena wî û di jor ra jî, sewa ku çavê wî li ser yên din be, serîyê wî yê li ser hêlekê xwarvakirî, dihata dît. Di vê navberê da, derûdor her çû zêde ron bûbû. Li hêla din ya cadeyê dimenek ji avahiya li hember ya bêserîûbinî, reşegewr, bi pencereyên rêzbirêz û enîbirrek zelal xuya dikir. Ew nexwaşxaneyek bû. Baran hîn dibarî, lê bi hebên gir û yekbiyek xuya, yên ku bi forma tenê serî xwe di erdê da dihatin xwarê. Li ser maseyê lodek firaqên taştîyê sekinîbû. Li ba bavê, taştî xwarina rojê ya di ser giştan ra bû û bi rû xwandina rojnameyên çeşîd bi çeşîd

da, bi saetan diajot. Tam li diwarê li hember fotografekî Gregor ji çaxa wî ya eskerîyê hatibû lidarxistin. Tê da, ew mîna serpel dihate nimandin û çawa ew, dest li ser şûr, bêxem û rûbiken, ji bo helwesta xwe û unîformayê daxwazkarîya hurmetê dike. Deriyê odeya mêvanan vekirîbû û ji ber ku derîyê malê jihevkişîbû, li meydana li pêş malê merdîwana ji bo berjor helkişîn û berjêr daketînê ji merivan va xuya dikir.

„Niha“ Gregor got û pê qanê bû ku tenê ew e yê ku bi aramî tevgerîya bû, „Ez ê kincên xwe li xwe bikim, çikina xwe bi hev da bikim û bi rê kevîm. Hun dixwazin, ma hun dixwazin ku ez bi rê kevîm? Aniha, Berdevk ê Mîrza, hun dibînin, ez ne serhişk im û ez hez dikim kar bikim. Rêwîtiya bazirganiya seyar mijûliyeke bi meşeqet e, lê ez bê wê nikanim bijîm. Ma hun diherin ku derê, Berdevk ê Mîrza? Cihê kar? Erê? Ma hun ê her tiştî li gor rastîyê rave bikin? Di vê gavê da, dibe ku meriv nikaribe kar bike, lê hîngê tam wexta xwe ye ku meriv serkevtîyên berê bibîrbîne û li ber çavan bigre ku meriv ê paşê, gava astengî berteref bû, bêşik hîn bi jîrektî û xweberehevkişî bide ser kar. Hun jî rind dizanin ku ez çiqas pir minetdarê serdarê bazirxaneyê me. Ji hêla din va, qeramê

dêûbav û xwangê î li ser min e. Erê, ez î di tengîyê da me, lê ez ê xwe jê xelas bikim. Ji min ra manîyên nû dermexin. Li Bazirxaneyê ji min ra alîkar bin! Dizanim, kes ji bazirganê seyar hez nake, ew î mîna yekî ku lodek pere qezenc dike û di sayê wê da jîyanek xwaş diajo, dihê dîtîn. Mixabin wesîleyeke xas ya ku meriv pê vê pêşhukimîyê baştir mitala bike, nîne. Lê hun, Berdevk ê Mîrza di derheqê rewş û têkîlîyên bi gîştî da, ji xizmetdaran giştan pirtir xwedîyê hayadarîya ne. Heta, di navberê me da be, ji serdar ê bazirxaneyê jî pirtir, ew ê ku wekî xwedîyê bazirxaneyê di hukimdayînê da xwe bi hêsanî li dijî xizmetdaran, şaş dike. Hun jî rind dizanin ku bazirganê seyar yê ku bi dirêjîya salê li dervayî bazirxanê ye, bi hêsanî dikane bibe qurban û armanca zem, peyvagotin, neheqî û şikayetên bêbinî. Xweparastina li hemberî van ji bo wî qet jî ne mimkun e, ji ber ku pir cara haya wî ji van naba. Tenê, gava ku ew ji rêwîtiyekê xişehal vedigere mal û encamên wê yên neçê, yên ku wî nedikanî di sebeba derketina wan biderînê, li bedena xwe hîs dikir, hay jê dibe. Berdevk ê Mîrza, neherin, bêyî ku hun ji min ra gotinekê bibêjin ya ku bi min bide nimandin, ku hun qet nebe ji bo bireke piçûk ji van heq didine min!“

Lê berdevk hîn bi şorên Gregor yên pêşîyê va rûyê xwe guherîbû û di ser milên kutayî ra, bi lêvên nureserhevkirî li Gregor vedinihêrî. Û ew, wexta ku Gregor deng dikiş, qet di şûna xwe da nesekinîbû, wêdetir wî xwe, bêyî ku çavên xwe ji Gregor veqetîne, gavbigav berve dêrî bada, mîna ku qedexeyeke veşartî ya terkkirina odeyê hebe. Ew zû gihêştibû mabeynîyê û di pey xwebakirina ji nişkava ya ku wî pê cara paşî lingê xwe ji odeya mêvanan dikişand, meriv ê bawer bikira, ku wî panîya xwe vê saetkê şewitandiye. Lê li mabeynîyê, wî destê rastê rind berve merdîwanê dirêjkiribû, mîna ku li wir rizgarîyeke serxwezayî li benda wî be.

Gregor qane bûbû ku, eger nexwasta zîyaneke giran bigihê meqamê wî yê li cihê kar, wî qet rê nedaba ku berdevk di vê halê ruhî da biçûya. Dêûbav rind di van tiştan giştan nedihêştin. Bi dirêjîya salan li ba wan bawerîyeke ha çêbûbû, ku Gregor di vî karî da debara jîyana xwe bidestxistîye û ji xeynî vê, ew niha zêdetir bi derd û kulên vê gavê ra wer mijûl bûn, ku her çeşîd pêşbînî ji bîra wan çûbû. Lê ev pêşbînîya li ba Gregor hebû. Divîya bû ku rê li ber berdevk bihata girtin, ew bihata haştkirin, bihata bawerikirin û li dawîyê bihata bivîalîxistin. Dahatîya

Gregor û malê bi vê va girêdayîbû! Xwazî xwang li vira bûya! Ew ê heşgihêştî bû. Ew girîyabû, wexta ku Gregor xwe hîn haşt li ser piştê dirêj kirîbû. Û bêguman berdevk yê ku hezkirê xaniman bû, ê bi hebûna wê rûguherî bûya. Wê kaniba derîyê malê li ber bigirta û li mabeynîyê tîrsa ji ser wî helnaba. Lê mixabin xwang niha ne li vira bû, Gregor mecbûr bû bi xwe tevbigeriya. Û bêyî ku wî şik bibira, ku hîn haya wî jidesthatîyên wî yên tevgerînê ên vê gavê tune ye û bêyî ku li ber çavan bigirta ku dengkirina wî jî mimkûn e yan guman heye ku dîsa nehê fehmkirin, ew ji paş perê dêrî biderket. Di navberê vekirî ra derbas bû û xwast ku here ba berdevk yê ku xwe, meriv ê pê bikeniya, bi her du destan bi derabeya li pêş girtibû. Lê Gregor cihlê bi wêrîniyeke piçûk va, pê ra jî li pêgirekê digeriya, li ser kerîyê lingan ket. Hema di pey va, wî cara sifê vê sibehê kêfekî bedenî hîs kir, çîpikên wî li ser zemînekî pît bi şûn bûbûn û wî bi şahî tespît kir ku wan bê rêşaşî guh li wî dinan, heta ew amede bûn ku wî bibin dera ku ew bixwaze. Û loma wî bawer kir ku êdî çareyeke abedî ji gîşt derdkêşîyan ra li ber dêrî ye. Lê di hema pêçê da, gava ku ew bi hêjîna ji ber tevgerîya bibaldarî ji dêya xwe pir ne dûr, tam li hemberî

wê li erdê sekinî, dêya wî ya ku di şûna xwe da pir bixwedakerî xuya dikir, bi carekê ra ji cihê xwe firîya, bi çepilên berjor helnayî û tiliyên jihevvekirî bang kir û got: „Hawar, bi navî Xwedê hawar!“ Wê serî xwar va kiribû, mîna ku bixwaze Gregor rind bibîne, lê li dijberî vê, bê mene, ew bi lez paşva vekîşîya. Wê ji bîr kiribû ku maseya dagirtî li paş wê bû, gava ku gihêştê, hay ji xwe nebû, cihlê li ser wê rûnişt. Û mîna ku ferq nekiribe, li kêleka wê, ji qehwedankê gir yê gêrbûyî da bi gujîniyeke şên qehwe li ser xêlî velo dibû.

„Dayê, dayê,“ Gregor bi dengê giran got û berjor ber ve wê mêze kir. Ji bo bîstekê berdevk bitûn ji ber çavên wî wenda bûbû. Li hemberî qehweya ku dirijîya, wî nikanîbû li xwe men bikira, xwast ku çend cara bi çeneya xwe wê bidest bixe, lê vala çû. Li ser vê, dayê qîrîya, ji maseyê bi dûr çû û kete çepilên bavê yê ku bi lez bergihinde wê dihat. Lê niha wexta Gregor ji bo dêûbavê xwe tune bû. Berdevk êdî li ser merdîwanê bû, çene li ser derabeyê, cara paşî ji paş xwe va mêze kir. Gregor hemle kir ku xwe bigîhine wî. Berdevk pê hêşîya, loma bi gavavetineke di ser çend pelingan ra, wenda bû. Di pey va wêrinî bi ser ket, got „Wey!“, dengê mîna çînginî jê biderket

û li valahîya merdîwanê belav bû. Mixabin bi bazdana berdevk êdî bavê jî, yê ku heta wê gavê xwegirtî dixuya, xwe bitûn şaş kir. Şûna ku bi xwe bide pey berdevk yan jî qet nebe li ber bipeyketina Gregor nebe rêgir, wî bi destê rastê rahîşte gopala berdevk ya ku wî bi fotêr û şarpe va li ser paldankê cihîstibû. Û wî bi destê çepê jî rojnameyeke mezin ji ser maseya helna û bi reperepa lingan, bi vir û wê da bakirina gopal û rojnameyê hewl dida ku Gregor bide ber xwe û bi şûnda vegeirîne odeya wî. Bergerînên Gregor tu fêde nedikirin, tu tîka û keremên wî nedihatin fehmkirin û wî çiqas serîyê xwe li ber xwar va bikira jî, bavê her ku çû bi quwet bi lingan dikire reperep. Li hêla han, çiqas ku hewa sar bûya jî, dêya wî pencereyek vekir, tê ra serîyê xwe berva derva xwar va kir û rûyê xwe yê berve derva kirî, bi her du destan gûvaşt. Di navberê cadeyê û valahîya merdîwanê da hewayê cereyan dikir û pê perdeyên pencereyan berba dibûn û rojnameyên li ser maseyê dikirin xişexiş û hen rûpelên wan li erdê dixûşîyan. Bavê, mîna ku hov bûbû, bê însaf ling dida ser Gregor, fişnî berdidan. Lê Gregor hîn birêvaçûyîna bervepaş hu nekiribû, bi rastî ev bi wî pir giran dihat. Eger

Gregor bixwasta û bi şîya bikira xwe biçixanda, wî yê xwe hema bigihanda odeya xwe. Lê ew ditirsîya ku bi çerixandinê ra, ya ku jê ra wext divîya bû, bavê bêsebir bibûya û her gavê tehlûke hebû ku ji gopala di destê wî da, derbeyeke ji kûjtînîyê ra li piştê Gregor yan li serîyê wî biketa. Lê li dawîyê ji Gregor ra tu çareyek nemabû, çimkî ew bi vecinîqî têgihêştibû ku wî yê nezanîba xwe li hedefa birêvaçûyîna bervepaş bigirta. Wî weha, bi nihêrînên binçavan yê ber ve bavê, bi tirs û li serhev, dest pê kir li gor imkanan, bi lez, di rastî da pir zêde giran xwe biçerxîne. Di vê hewldanê da, bavê ew rehet cihîşt, mîna ku ew bi hemda Gregor ya pak hêsiyabû, berevajî li vir û wê, di tevgerîya wî ya çerxbûnê da bi pozî gopalê ji dûrê da rê nîşanî wî dida. Ax, ev fişînîya bavê ya ku nedihata kişandinê nebûya, wê heş ji serîyê Gregor dibirin. Pir hendik mabûbû ku wî yê xwe bitûn biçerxanda. Lê ji avrûyê vê fişînîya bavê da ya ku guhê wî tim li ser bû, xwe şaş kir û çend gavan paşva kişand. Lê gava ku ew êdî gihêşte ber dêrî, xuya bû ku bedena wî ya zêde biber nedikanî bêzehmet di navbera dêrî ra derbas

bibe. Ji ber rewşa ku niha ew tê da bû, qet nehate bîra bavê ku perê dêrî yê din jihev bikira û sewa derbasbûna Gregor karikeke têr fereh çêbikira. Fikra wî ya sabît ev bû, ku Gregor zûtir bigihêsta odeya xwe. Wî hîç nedixwast ku rê li ber tevderîyên dûr û dirêj vebikira, yên ku pêdivîya Gregor pê hebû, da ku wî pê bikanîba di dêrî ra derbas bibe. Mîna ku tu astengî tune bin, wî Gregor dabû ber xwe û bi reperepeke gurr pêşva dibir. Li pey Gregor, te yê bigota ne dengê bavekî tenê heye. Bi rastî êdî ne şûna yarênîya bû û Gregor bi lez ber ve dêrî –çi diba ma bîba– dikişîya. Hêleke bedena wî berjor helat, ew di karika dêrî da xwar sekinîbû û kêlekeke wî bi xwelêxistinê bitûn bi birîn bûbû. Li ser derîyê sipî mangên bi bed man. Pir neçû, ew girtî ma û bi şîya nekir ku xwe bi tenê bilivanda. Çipikên hêleke wî li hewa mabûn û vedilîstin û yên hêla din bi êş ber ve erdê hatibûn xwarê. Hîngê bavê ji par ra bi derbeyeke pît, ya ku bi rastî ew pê xelas bibe, kuta wî. Ew pê, di halekî xwîn biserketî da ber ve nava odeyê firîya. Derî jî bilêxistina bi gopalê hate girtin, paşê êdî bédengî daket.

Dûvmayî heye

Mainz, (Almanya) 20.12. 2014



# Sîyarê Têrika -4

Bi zaravayê Mikaîlîyên Polatliyê

Dr. Mikaîlî

## Os Mela Şewqî nas dike

Derîye camîyê giran giran bi dengêkî mîna tekera gaxnîyê derdixist, wewû, li ber dêri kalekî girî rûspî peyda bû. Cemekanîyekî spî û heta erdê dihat, li wî bû, di nînga da solê ji dara hewûn, nîng xasê wûn. Li sêrî kumekî bi desta hatiwû ûnandî û li dor kum jî poşîkî zeraxî şidandî wû. Ji çava germehîyeka însanî belaw diwû, li ser çava jî brûye spî û qalîng dirêj diwûn.

Osê bi dîtina wî ji xu va heziya, kelecane ket dilî wî. Mêrikî kal ji wî ra; Tu bi xêr hatîyî mala Xadê! Ka ez ji bo xêra Xadê çito bi te ra biwim yar û yarmetdar? Dengî wî ewqas nerm û germ bû ku, wek bawekî, wek mezinikî ji malê. Ew tirs û kelecana Osê bi yek va anda bû. Osê got; ez li dergaha Mevlana Xalid digirim, dixwazim biwim telebe wî, li ber wî bixûnim, ji boyî vê ji Engürüyê (Ankarayê) hatim.

Mêrikî kal carike din li wî nêrî. Li hemberî wî xortekî hinnû simêl derdikevî, di nav kinc koli kevn û çilmisî da, bi rûyîkî westîyayî, lê bi çavên tiji xastek û hewîdar sekinîbû. Wî zanî ku ew rastîyê diwêje, parsek nîni.

Ji ber ku her ro, çend kese wek wî dihat ber derî wana, le piştî roya ku hîn kinc minc ji wan hilgirtin û zike xu têr kirin, bê xeber ji holê anda diwûn, kesî jî ew tu carik din nedidîn. Le ji hal û wexta vî xortî da tişteki din hewû, tişteki wek daxwazê, wek hêrsê, bi rawestandina wî da eşkere diwû ku wî ew kirîyi heşî xu û bi biryar hatîyî Stenbolê.

Mêrik go; Wari hundir xortî delal, tu rast î, wira derîyê Xalid Efendî ye!

Osê merase xu derxistin, gorên wî gî qiler bûwin û di pehnî û peçîya girikê da jî dirya wûn. Ji xu fedî kir, ew fedîya wî bala wî kalî kişand, destê xu avêt ser milê wî û got; Xorto ew ne mesele ye, ku me tu bir şûna tu lê bimîni, li wir tu yê avê li xu kî û kinci xu bigorî, çî hewcedarîya te jî hewin ê li wir bên dayîn!

Derbasî hundirî mizgeftê bûn, di dêri da bi nerduganên kevirkî daketin jêr, mêrike kal li pêş, ew li paş, qasî panzdeh nerdugana çûn û gihiştin odekê.

Merikî kal jê ragot; Wira fiqarexana min î, ku kare mi tunnewû, tîm li wir bîhna xu didim ber xu, yan jî tiştina

dixûnim. Heta ku em terin dergaha Şêx, tu yê li vir bimîni, hinkî xu dirêj kî. Şûn ra wî da, ji bo ew lê rûnni. Os li pê ma, heta ku ew rûnenişt, ew jî rûnenişt.

Kalemêr got; Hele tu biseke, ez ji te ra çiçik xarin û vexarinê bînim. Dûra derket û gavik şûva li hemêzê naneka bajêr, guhşikî turi û parçekî pennêr va dîsa hat. Li ser zinîyeka çûk û paxirî ewna raxistin, û Osê ra got; ka devrû xu bişo û wari em bi hevra zikî xu têrkin! Os hema bazda derva li şadîrvana camîyê av avêt devrû û ningê xu, ha rind ew jî şuşt in, zivirî odê, bi serî xu û çavi xu kalemêr silavkir û li ser sifrê rûnişt. Lê li bendê sekinî ku bira ew kalemêr destbi xarinê biki.

Mêrik jê pirsî; navî te çi yî xorto?

Osê got; Os! Os e navî min, weka kurmançî jê ra diwêjin. Wekî din, got merik?

Osê ferq kir ku li vira ewê navî xuyî li nav bajara biwêji, xu wakîna bîdî nasandinê û got; haa, di kutigê da Osman hatîyî nivîsandin, Osman! Osman! Ducar kir. Mêrik pê kenîya û jê pirsî; Osman tu çima dest bi xarinê nake, te jê hez nekir?

Osê lê nêrî, bi xu xu got, ew min îmtihan diki herhal, ka ez li berî mezîni xu dest bi xarinê dikim yan na!

Ew bibersivand; Apo me ji malê xu wakîna hukirî, hetanî ku mezin,

kal dest bi xarinê nekin, em naxûn!

Haa! got merik û parik nan bi pênêr va avêt devî xu û berda jî got; de kerem ki, afiyet bi ji te ra.

Bê deng xarina xu xarin, giranîk ket ser Osê, le wî fedi fikir ku çavi xu bigrê.

Kalemêr rawû pê, got; tu xu li vir dirêj ke, ez derdikevim jor, wexta limê (nimêj) hat, berî çûyîne ezê te rakim.

Berî ku derkeve, xu ha nivî çexkir û got; navî min Şewqî yî! Mela Şewqî Efendi jî diwêjin.

Û di tarîya qula nerdugana da anda bû, tenê denge ningi wî ku herçik diçûn bi dûrdiketîni û gavik şûva jî hendi qe nehat bîhistinê. Os temme bi serxu va çû, qe nezanî çito ket xewê. Waqas westîya bû.

Bi dengî ezanê bi xu hesîya. Mela bi gewrîyeka dawudî, avazeka xaş, ban dida. Osê bi desti xu çave xu mistdan, rawû xu gêr kir, çû ber qullê, ka bizani ew çi wext i, çiqas ramedîya bû.

Li derva hîn tîşe ro, sorrengîya xu dida êzmên. Wêngê pê zanî ku ew ji siwê da heta berhêvarê di xewê da mayî. Derket derva, hin mêr bi lez, hînika jî di nav xu da deng dikirin û dahatin camîyê. Ew çû ber şadîrvana mizgeftê hinik av li serçavi xu xist, hati xu.

Dû ra desmê ya xu hilgirt, ew jî tevî komê bû, bi paş Mela limê ya

xu kir, ji Xadê ra şukur kir ku ew rêwitiya wî heta nika bê nebaşî derbas bû ye û ew gîhiştî ye şûna xu. Ew kalemerî ku ew hilgirtî bû hundirî mizgeftê limê dida kirinê, pêşimam bû. Bi cemedanîyî xu yî dirêj, li pêş komê hîn bi heybet bû, yan jî li ber çavi Osê war xanê dikir.

Kom belaw bû, Os li benda wî sekinî, ew hat hindê wî; Înşallah tu rind raket?

Erê erê Ape Şewqî! got be dengêkî tiji şukran!

Wari em herin ji bo danî êvarê şîva xu amade kin.

Daketin jêr, gavek bi şûnda, deriye qulê lê ket, ew çû ber, jinikik li derva bû, bi destî xu qunce şarpa serî kişandû wû ber serçavi xu, got; Min ji we ra şîva êvarê anî, xêra Xadê ye, warin vê hilgirin!

Çavi Mela Şewqî kenîyan, Têm xuşka mi, têm! got bi kêfxaşi. Çexî Osê bû; De Osman beg, here vê Xatûnê rûmetdar ji barî wê xilas ke, Xadê rizqe me yî vê êvarê şand, dilê min xand herhal, Mi qe nedixwast ku îro şîvê bikelînim!

Os hema bazda çû, şîv ji destî jinikê hilgirt, qe li rûyî wê mêze nedikir, him ji jinikê fedi dikir, him jî ji xu. Heta va sali wî tu kesî ji wan ra, mala wan ra şîva êvarê nehanî bû. Heftê carê evara îne diyê wî yê ji şîva

malê tijikira û wî yê ew bibira malên fiqare ra.

Bi dengî jinikê venciqî; Xorto we xar daynin ber dêri, emê warin hilgirin! Xadê ji we razi bi ! Got Osê, bi dengêkî nizm.

Şîv bir jêr, Mela sifre raxistî bû jî, li ser rûniştin û pariye xu avêtin nav, li hêla nên kevçiyê ji dara jî hewûn. Ew kevçiyana li mala wan jî hewûn, li ser wana resme mevlana neqşandî bû, le wana tenê ku mîvanikî wanî ji derva hat, yan jî ku dawetek daynan, derdixistin. Bavî wî ew ji Qonyê hanîwûn.

Mela Şewqî got; Osman ew kevçiya ji vê şûva ê te yî, te xarina xu qedand, bişo û di beriya xu ke!

Os şa bû, li Senbolê hendi tişteki wî hewû. Piştî xarinê sifre berhev kir, sehen bir derva, li ber avê şuşt û da ber dêri. Kevçiyê xu jî şuşt bi dismala xu warda û kir paşila xu. Bi şawûneka wek zaroya.

Mela Şewqî xu dawû ber dêri, li hêlikê da li wî dinêrî, li hêlikê da jî bixu xu digot; Va xorta ji malike rind da tê, rawûn û rûniştina xu dizani, hurmetkar i. Cemaatê kesekî baş qezenc kir Înşallah. Bi dengî xuyî qalîng bang kir; Osman ez her êvar, li dû şîvê hinkî li çarşiya Senbolê digirim, kêfa te heyî, tu jî dikari bi mi va wari!

Os pirr şa bû, sere xu leqand û got ; E zehf rind bi, ez jî Senbolê û

merî vira pir meraq dikim! Û Şekalên xu kirin pê û da dû Mela...

Peşta xu dan qamekî, rê ji kevra bû, rast çep pir qerebalix bû, ji her rengî, cureyî meri hewûn, li hêla rê bi singên bilind û dirêj va lambe didaliqîn, lambê rûn. Du mêra, di desti wanda dar dişewitîn, yek bi yek ew lambana wêdixistin. Meriyî ku li bin şerqa lambê da dimeşîyan, sîya wan jî bi wan va dimeşîya, kêfa Osê pir bi wan hat.

Mela banê kir; Osman pirr ji min neqete, emê hevûdu anda kin, vira ne gunde te yî ha!

Osê hema da tîzika, ku xu bigêjini wî. Di rê da pir meriya Mela silavdikirin; Akşam şerifler hayr ola! (Hevara we bi xêr bi!) Mela bersiva wan dida; Hayirlar hepimizin ola! (Bira li mi giştika bi xêr bi!) Bi osmanîya Senbolê...

Osê bala xu pirr dida gotin û zimanî wan ku zûzîkê da mîna wana deng ke, biwi yekî ji wana. Bala xu dida rêvaçûna mella û ê din. Meriyî vira ne wek gundîye wî diçûn, xu doq dikirin, gave xu pirr bi ritmekê li paş hev davêtin, sere xu ha hinikî ji stu da bervi paşîyê digirtin, dest û pî jî dîsa wek çîpa war li hêla xu bi badikirin ku te ye bigota her livandina wan ji hêla kesekî din va ji wan ra tê gotin, yan jî tê emirkirin.

Gundîye wî hatin ber çavi wî, gera wan, rêvaçûna wan, meşa wan. Tu derik wan bi hevra nedimeşîyan, her alikî wan bi serî xu wu, teye bigote qey pî terin derikî din ning terin derikî din, haya seri jî qe ji wan tunne yî! Çîçikî mîna hurça, çîçikî mîna pêlwanekî li meydanê ji reqîbi xu ra meydanê dixwazi...Herdu pî yi xu nîv hemêzkirî vedikin û li ser şeçe xu jî haa xu berbi jor va dihezînin. Ber xu da bi wana keniya.

Mela ew dî û got; Osman bi çi dikenî?

Wî ji wî ra qala ew fikirên xu kirin, qala bajarî û gundiya, xu dikir delqî wan û mîna wana dikir. Ew teqlit dikirin. Li nav rê, çarşîyê him diçûn, him dikenîyan. Melayî ku pir ciddi, mêrî giran, bi zikî xu digirt û dikenîya. Kêfa xu pirr bi qalkirina Osê hatiwû û got; Osman zûva bû ez waqas nekenîya bûm. Te ez dam kenandinê, bira Xadê jî te bikenini! Osê got; Amin!

Ji derî çarşîyeka sergirtî da ketin hundir. Şev bû, le hundir mîna ro, hênîk bû, li herdu ali çarşîyê bi sedan dukan hewûn û bi dengêkî bilind ji bo yî firotina tiştî xu diqîrîyan. Cumbaşa renga wû. Bîna baharat, kakil kunci û xuya mêra tevlihev dihat, diket poz bivîli meriya, le herçik diçûn jî bîneka ha xaş, a ku Osê yek cara di konî begî

êlê da, li cem Mikailîya da nasdikir ji nêzik diwû. Ew bîna qehwa teze herandî wû. Ose pirr ji vê bînê hezdikir, ku mîvanîkî giran dihat, ew li dora konî aşxanê nedîçû derikî din, ji bo yî ku ew qehwê ji mîvani giranbiha ra biwi û di wexta birinê ji wê bînki! Pirr dixwast wê wexu jî, lê nediket para wî...Eyb bû ku zarokik qehwê wexu, ew bêedebî bû. Os ji xortikî hînnû digîha û xadan hurmet û rûmet bû.

Hatin ber derî qehwexanê, ji wir xortikî panzde salî xanê dikir hema beziya û dû kursîyê ji xêsir unandî, dan binî Mela Şewqî û wî ji. Wî ew xêratî kirin, dû ra xu du gava paşva kişand û ji Mela pirsî; Mîna hertim Mela Efendî? Wî seriye xu ha nîv li ber hêlikê da tewandî wû, herdu deste xu jî li pêş xu va bi hevra gerêdawî bû, şalekî bi desta çêkirî, fere û li bin û di ser da jî kirasikî gewr û qutikiki sor bi deziyî zêraxî neqşandî, lê bû.

Mela got erê û çex Osê bû; Xorto tu ye çî wexû?

Osê hînkî xu da zorê û çave xu jê revandin, bi dengekî sivik; Mela eger musaade te hewû, ez jî dixwazim li tehma qehwekê mêzekim! Mela bi çavî xu kenîya û got; Serseran mîre mi!

Ji wan ra qehwe hatin, Osê bi ruhîkî piroz, bi dilîkî pirr şa, qehwe hindik dadîqultand, ne dixast tu bala kesî jî bikşîni ser xu! Tehmeka tehl bû, dev û bivîla wî şewitî, bi xu xu got; Xadêo! Meri çima ewqas ji wê hez dikin?

Mela dît ku wî mûriz kişand, ji wir da bang kir; Hoste! Ka çend Lati loqim ji bi me di!

Ew hatin, Mela qehwa xu bi firfirika bi deng wedixar û ser da jî nîve Lati Loqim davêt devî xu. Osê jî mîna wî kir, wekina pê kêfa xu hat, şa wû...

Mela bi cemaatê va ket sohbeteka kûr û dûr, Osê tenê li wan dinêrî, lê di hişî wî da reva wî, rêwitiya wî û ewê li vir çibiki, ew diçûn û dihatin, ew pirr jî westîya bû, sere xu berda ket û ket xewka şîrîn û kûr.

Bi dengî Mela heşar bû, Mela digot; Osman! Osman! Rawi em herin mala xu! Siwê jî te biwim dergeha Mevlana Xalid Efendî! Li wir em te bi cih bikin û tu jî dest bi medresa xu biki.

Rawûn, ji cemaatê xatir xwastin û dev dan ber mizgefta Valide Sultan ê. Osê xu hema avêt nav cilla û bi heyecan û meraqa çûyîna dergehê ket xewê...

# Serîlêdan

Ev kesên ku bixwazin navê gund, belde, cih û warên xwe vegerînin ser yên berê, yên esîl dikarin ev numûna serlêdanê bi kar bînin.

Bîrnebûn

## Başvuru dilekce örneği

Kulu, 29.09.2014

KULU KAYMAKAMLIĞINA

TALEPTE BULUNANLAR : Aşağıda isimleri, imzaları T.C.  
kimlik no'ları ve adresleri bulunanlar.  
T. KONUSU : Köyümüzün/mahallemizin eski  
isminin alınması için gerekli  
işlemlerin yapılması isteminin sunumu.

## AÇIKLAMALAR VE TALEP:

Bizler aşağıda isimleri ve kimlik bilgileri bulunanlar, Kaymakamlığınız sınırları içerisinde bulunan Karacadağ Köyünün/mahallesinin sakinleriyiz. Ata-dedelerimiz gibi hepimiz bu köyde doğduk ve bu köyün nüfusuna kayıtlıyız.

Resmi kayıtlarda köyümüzün/mahallemizin ismi Karacadağ olarak geçmektedir. Fakat kurulduğu günden bu yana köyümüzün gerçek ismi "Xelikan"/(Xelikane Jor) dır. Ata-dedelerimiz baştan bu yana köyümüzün ismini böyle tanımladığı gibi, çevremizdeki köylerde yaşayan insanlarda böyle tanır, böyle bilirler. Köyümüzün tarihinde resmi olarak yetkililer tarafından verilmiş farklı isimler (.....Yalınayak, Karacadağ) olsa da halk arasında hep Xelikan olarak bilinmiş ve öyle tanımlanmıştır.

Dönemin başbakanı şimdi ise Cumhurbaşkanı olan Sayın Recep Tayyip Erdoğan tarafından 30.09.2013 tarihinde açıklanan demokrasi paketinde, eski köy isimlerinin iade edileceği ve mevcut alfabede olmadığı için kabul edilmeyen **x, w ve q** harflerinin kullanımına izin verileceği belirtilmiştir.

Köyümüz/mahallemiz kurulduğu günden bu yana hep "Xelikan" ismi ile bilinmekte ve halk arasında da bu isim kullanılmaktadır. Bu nedenle köyümüzün/mahallemizin kayıtlarda görünen "Karacadağ" isminin kaldırılarak gerçek ismi olan "XELİKAN" olarak teşçili için gerekli işlemlerin başlatılmasını saygı ile arz ve talep ederiz.

|                             |                            |
|-----------------------------|----------------------------|
| ..... (T.C. Kimlik No:....) | .....(T.C. Kimlik No:....) |
| Adres :                     | Adres:                     |
| .....(T.C. Kimlik No:....)  | .....(T.C. Kimlik No:....) |
| Adres:                      | Adres:                     |
| .....(T.C. Kimlik No:....)  | .....(T.C. Kimlik No:....) |
| Adres:                      | Adres:                     |



Foto: Ylva Yngvesson

Xelatgirê Nobelê yê edebîyatê, Tomas Tranströmer (83 salî), di 27 adara 2015an de mir.

## Helbestên Tomas Tranströmer bala herkesî dikişînin...

Ew di sala 1931an de li taxa Södermalma Stockholmê tê dunê. Ji ber dê û bavê wî ji hev cuda bibûn, ew li ba diya xwe mezin dibe.

Hê di xortanîya xwe de, dema diçû lîseyê, dest bi nivîsandina helbestan kiribû. Wê demê bi grubeka xortên ku bala wan li ser edebîyatê bû re ketibû têkilîyê. Ev dibe sebeb ku ew rêya xwendin û lêkolîna hîn zêde ya li ser edebîyatê bide ber xwe û bi vê ra girêdayî, edebîyat û pisîkolojîyê dixwîne. Wek psîkolog kar dike û di wê navberê de nivîsandina helbestan berdewam dike û êdî wek şaîr jî tê naskirin.

Di 1958an de kitêba xwe ya helbestan wek *debutant* bi navê *17 dikter* (17 helbest) diweşîne. Bi

derketina vê kitêbê re wek şaîr tê hezkirin û navê wî di nav helbestvanên swêdî yên bi navûdeng de belav dibe.

Di 2011an de xelata edebîyatê ya Nobelê werdigire. Berhemên wî yên pir tîn naskirin, *Den halofärdiga himlen* (Ewrên nîvçemayî) och *Sorgegondolen* (Gondola xemgînîyê) ne.

Tomas Tranströmer li dunê nav dabû. Helbestên wî heta niha bi 60 zimanî hatine belavkirin. Heta ji aliyê meleyên Îranê ve jî hatine çap û belavkirin.

Heval, nas û hezkirîyên Tomas, wî weng didin naskirin; wî qet pesnê xwe nedida ne li pey prestîjan bû. Ew her tim bi nivîsandina xwe ve meşgul dibû û tiştê bo wî pir girîng, her nivîsandina helbestan bû.

Ali Çiftçi





Agirê Newroza 2015an li Egeby Gârd a Spångayê.

Wênekêş: Hacî Kardoxî